## Rojnameya we dest bi weşana nû dike

Rojnameya Xwebûnê nêzî salekê ye bi zimanê kurdî weşangeriyê dike û hewl dide geşedanên li Kurdistanê diqewimin ji civakê re ragihîne. Ev demek e ji bo weşaneke xurtir em amadekariyên dema weşana nû dikin û di serdema nû de em ê bi naverokeke dewlementir bigihêjin xwînerên xwe.

## 1 Nivîskarên nû

Di dema weşana nû de dê nivîskarên nû ji bo rojnameyê binivîsin û em ê hejmara nivîskarên xwe zêdetir bikin. Em dixwazin cih bidin nivîskarên li hemû parçeyên Kurdistanê.

## 2 Dosya û lêkolîn

Di vê serdemê de em ê bêtir cih bidin dosya, nûçeyên taybet û nûçeyên lêkolînî. Deriyên me ji her kesî re vekiriye; her kes dikare dosya, nivîs û nûçeyên xwe ji me re bişîne.


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

12-18 Cotmeh 2020
Hejmar: 43
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


## Bi girtina rojnamegeran rastî nayên nixumandin

Di meha îlonê de li navçeya Şax a Wanê leşkerên ku derketibûn operasyonê û welatiyên bi navê Servet Tûrgût û Osman Şiban binçav kiribûn û ew ji helîkopterê avêtibûn. Tûrgût, piştî tedawiya 20 rojan jiyana xwe ji dest da û Şiban ku bi Tûrgût re ji helîkopterê hatibû avêtin jî hê bi ser hişê xwe ve nehatiye û nikare îşkenceya ku li wan hatiye kirin bîne ziman. Rojnamegerên ku bûyer derxistin holê bûn hedefa hikûmeta tirk. Di 6'ê cotmehê de rojnameger Nazan Sala, Adnan Bîlen, Cemîl Ûgûr û Şehrîban Abî hatin binçavkirin û piştre hatin girtin... RÛPEL - 3



# Pif dikin nepoxê



Li Tirkiyeyê hemû endeksên ku baweriyê didin piyaseyê serberjêr bûne û rayedar dîsa jî pif dikin nepoxê (balon) û nepoxê tije dikin. Bi makîneya propagandayê aboriyê bi rê ve dibin. Her roj dibejên, dê sibê ji îro çêtir be. Di BAN'ê de jî tu nîşaneyeke bawerî û hêviyê ya dê piyase sererast bibe, tune ye. Rewşa nîşanên 2023'yan jî bûye rewşa belengaziyê... *Ramazan Tûnç* / RÛPEL - 6

## Di baweriya yarî de jin

Dîroka yarsanî di rûpelên zêrîn û serbilind de bi hemû mezinahî û rûmeta xwe vegotina demê ye ku navên ebedî yên gelek jinên hêja û navdar tomar kirine. Gelek jinên ku di dema xwe û di hemû dîroka mirovahiyê de hebûn, van jinan ne tenê di ola yarsanî de rol lîstine, belkî her yek ji wan rê û rêzik ji vê baweriyê re destnîşan kirine û exlaqê ku civak li ser bimeşe... *Zehra Mohammedzadeh* / R.2

## Hedefa kompoloyê gelê kurd e

Bi ser dagirkeriya Serêkanî û Girê Spî de salek derbas bûn. Di nav vê salê de gelek bûyer û pêşveçûnên dagirkeriya dewlata tirk neheq derdixin hatin jiyîn. Ji ber navê êrîşê, êrîşa dagirkeriyê ye, ne gengaz e ku tu aliyên wê yên mafdar hebin, lê em ji bîr nekin ku roja êrîşên dagirkeriyê dest pê kir, yanî roja 9'ê Cotmehê ne rojek ji rêzê ye. Ev roj bi zanebûn hat hilbijartin ... *Felemez Ulug* / R.3

## Siyabend an jî qeder

Siyabend, Siyamend, Sîehmed... Siyabend û Xecê, çîrokek çîrokilamek bi nav û deng a welat û civaka me ye. Nizanim ji ku dest pê bikim(.) Lê ez a dilê xwe ji serî de bibêjim. Naveroka vê destanê bala min gelekî dikşîne û ez serê xwe li ser pir diêşînim. Çawa mirovek diwêre bibêje "ez ê li qederê, li felekê bigerim û heyfa xwe jê hilînim!" Ev tiştekî pir balkêş e... *Feratê Dengîzî* / R.5





## Axaftina pîra min

Hunermend Vedat Yildirim pirsên rojnameya me bersivandin û wiha got: "Periya afirandinên min pîra min e. Navê wê Edûl e. Rîtima axaftina wê mîna ava aram malzaroka hunera min e."... *Hevpeyvîna Bêrîvan Kayî* / R.4

## Yekitî dê bibe bersiv

Bi salan e gel, partî û saziyên kurdan ji bo pêkanîna yekitiya neteweyî ya kurd li çar parçeyên Kurdistanê di nav kar û xebetan de ne. Hewldana ji bo yekitiyê dibin qurbana berjewendiyan. Hevserokê PYD'ê Enwer Muslîm got ku yekitî dê ji hemû gefan re bibe bersiv... R.7

## Terapî de hunerî


Însan, rîyê erdî ganeyêke zaf zelal û qasê zelalbîyayîşê xo zî hende têmîyan o. Bi bîyayîşî însanî dir problemî zî vejîyayê meydan. Hîn problemî tebîî bîyê û hîn zî bi destê însanan ameyê meydan. Sey; afat, şer, vindîkerdiş (merg) şîdet ûsn hîn însanan de bîyê sebebê travma û coka seba weşîye psîkolojî û ruhî, xeylêk cigêrayîşî virazîyayê û hetê zanistan ra tewir tewir rayîrî ameyî ceribnayîşî. Nê ceribnayîşan ra yew zî; terapîyê hunerî yo... *Gulçîn Adar* / RÛPEL - 9

# Pênûsa Erdelanî dengê Sûsika Simo

Navenda Nûçeyan

Li ser rûyê erdê gelek qebîle, kewîm, civak û gel hene ku ji bo berdewama çand, ziman, wêje, kevneşopî û hwd. û veguhstina ji bo nifşên nû, gelek li ber xwe dane û têkoşiyane. Gelê kurd jî yek ji van civakan e.

Gelê kurd bi taybetî bi rêya wêjeya devkî, çand û zimanê xwe parastine û ew veguhastine nifşên nû. Wekî her tiştî ji bo parastina çand, ziman û kevneşopiya civakê dîsa jinên kurd pêşengî kirine. Di her serdemê de, jinên kurd li gorî şert û mercên dema xwe, hewl dane yan bi wêjeya devkî yan jî bi wêjeya nivîskî çand û zimanê xwe biparêzin û bigihînin pêşerojê.



Di dîroka gelê kurd û jinên kurd de Mesturey Erdelan Kurdistanî û Sûsika Simo du jinên girîng ên serdema xwe ne. Ew her du jinên ku di wêjeya devkî û nivîskî de ji bo berdewamiya çand û zimanê kurdî ked dane, hê jî di roja me ya îro de ji aliyê jinên kurd ve wek mînak tên dîtin û xwe li mîrasa wan tê derketin.

**Dîroknasa yekemîn**

Navê wê yê rastîn Mahşeref Xanim e lê bi navê Mestûrey Erdelan Kurdistanî tê nasîn. Mahşeref Xanim ku wek jina kurd a dîroknas a yekemîn tê zanîn, di helbestên xwe de navê Mestûrey ku tê wateya 'girtî' bi kar aniye. Mestûrey Kurdistanî di sala 1805'an de li bajarê Sineyê tê dinê û xwedî malbateke arîstokrat e. Hîn di biçûkatiya xwe de dest bi xwendinê dike, ji bilî wêjeya farsî û erebî xwe ji aliyê fikiha îslamî jî perwerde dike. Di 28 saliya xwe de bi waliyê Sineyê Xusrewxan Erdalanî ku ew jî wekî Mestûrey Kurdistanî evîndarê wêjeyê ye, dizewice, lê Mestûrey piştî mirina hevjînê xwe ji ber sedema aloziya di nav xanedana mîrtiya Erdalanê de ji neçarî ji bajarê Sineyê koçî bajarê Silemaniyê dike û piştî salekê ji ber nexweşiyekê, sala 1847'an di 43 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dide.

Mestûre xwedî kesayeteke edebî bûye û dema hevjînê wê Xusrewxan li jiyanê bûye, kesên şaîr û zana di dîwana wê de kom bûne û li ser wêje, felsefe û zanistê nîqaş kirine. Di van civînan de Mestûre Kurdistanî xwedî cihekî girîng bû. Heta ji ber qabîliyet û kesayeta wê ya zana gelek nivîskar û helbestvan ên wê demê, di nivîsên xwe de pesnên wê dane.

**Helbest û Mestûre**

Gelek helbestên Mestûre Kurdistanî negihîştine roja me ya îroyîn. Di dîwanên wê de helbestên xwe bi du zimanan, bi kurdî û farsî nivîsandine.

Mestûre Kurdistanî piranî di helbestên xwe de bêrîkirina xwe ya hevjînê xwe Xusrewxan û di hin helbestên xwe de jî gazinc û her wiha hesreta xwe ya ji bo Sineyê aniye ziman.

**Sûsika Simo**

Di nav kurdên Yekitiya Sovyeta Kevn de, jina kurda dengbêj û hunermend a yekemîn a derketiye ser dikê Sûsika Simo ye.

Sûsika Simo di sala 1925'an de li gundê Mîrekêda ya herêma Elegezê ya girêdayî Ermenistanê wek keçeke malbata êzidî tê dinê. Sûsika Simo jina dengbêj a yekemîn e ku di sala 1946'an de li ser navê gelê kurd derketiye ser dikê û kilam gotine. Wê demê tu dengbêjên kurd ji aliyê dewletê ve nehatibûn qebûlkirin û Sûsika Simo cara yekemîn di sehneya dewletê ya Ermenistanê de kilam gotine.



**Kaset dernexistiye**

Mînak; Belgia Qadir û Aslîka Qadir tenê di radyoya Erîvanê de kilam gotine lê Sûsika Simo tenê kilam negotine her wiha derketiye ser dikê jî. Sûsika Simo ku ji ber şert û mercên dema xwe tu kaset dernexistiye, tevî vê yekê jî hin berhemên wê gihîştine roja me ya îroyîn. Sûsika Simo di sala 1977'an de li Erîvanê diçe ber dilovaniya Xwedê.

Bêguman ev her du jinên kurd ku di demên cuda de bi kar û xebatên xwe ji bo parastina çand, huner, wêje û hwd. pêşengî kirine, ji bo gelek jinên kurd bûne mînak.



Zehra Mohammedzadeh

## Di baweriya yarî de jin[1]

Di her bawerî û dînekê de qala jinê hatiye kirin; bi dûr û dirêjî li ser hebûna wê hatiye sekinîn; kêm be jî rol û bandoreke wê ya di ol û baweriyan de jî li dem û çaxên cihê çêbûye, lê belê hema bêje di hemû olên yekxwedayî û baweriyên cuda de jin li rêza duyemîn tê dîtin û destgirtin; ew ji zilam tê xuliqandin. Jin wê her tim zayenda duyemîn bê hesibandin…

Dîroka yarsanî di rûpelên zêrîn û serbilind de bi hemû mezinahî û rûmeta xwe vegotina demê ye ku navên ebedî yên gelek jinên hêja û navdar tomar kiriye. Gelek jinên ku di dema xwe û di hemû dîroka mirovahiyê de hebûn; van jinan ne tenê di ola yarsanî de rol lîstine, belkî her yek ji wan rê û rêzik ji vê baweriyê re destnîşan kirine û exlaqê ku civak li ser bimeşe wek qanûn danîne. Yanî ew di civak û ola yarî de xwedî rolek diyarker bûne.

Hin ji wan jinan wiha ne: Xatun Dayrak Celd ku wek Rezbar tê nasîn, Xatun Mama Celaley Loristanî, Xatun Beşîre, Xatun Zeyneb, Dada Sara (Dada Sarî, Xatun Esmerê, Xatun Zerbanû (Zelal banû), Xatun Sone, Xatun Perî, Daye Xezan Serketî, Xatun Leza Caf ( Mî Zerd), Xatun Nergêz Şehrezorî, Xatun Reyhane Loristanî, Xatun Fatime Lorî Goran û Xatun Semen Dudanî û gelek jinên din ên wek Daye Tebrîzî hene ku hêja ye mirov qala wan bike.

Ez ê di vê nivîsê de hewl bidim li ser hin xalên girîng ên ola yarî bisekinim û balê bikişînim ser hevsengî û wekheviya ku datîne navbera jin û zilam. A rast ew van her du zayendan di heman tewazûnê de digire dest û dinîrxîne, yekê bi ser yeke din de nagire dest û nanirxîne.

Bêguman baweriya yarî wek baweriyek pîroz a rastî ye ku di heqîqeta xwe a bêhempa ya gerdûnî de jinê di rêya manewî û hebûnê a ber bi mukemel bûnê ve diçe, wek keseke ku jiyanê pêk tîne, temam dike, digire dest. Jinê ne tenê alîkar û hevkarê mêr, belkî wek keseke ku di vê rê û pêvajoya rêwîtiya giyanî ya ber bi kamilbûn û meşrûbûna hebûnê ve, afirîner û têrkera taybet a jiyana mirovî dibîne.

Ji bo ku em di baweriya yarî de rola jinê bigirin dest û lêkolîn bikin, em ê li ser çend qalan bisekinin:

Qala sê demên xuliqandina însan tê kirin ku bi vî rengî ne;

Dema Meşî û Meşyane

Dema Çin û Maçîn

Dema Serendîl ango dema Adem û Hewa; helbet behsa dema Ben can ya benî can jî tê kirin. Yarî di vê baweriyê de ye ku beriya Adem û Hewa jî însan li ser rûyê erdê jiyane, lê li parzemîneke din bûne ku xwedî nijadên cihê yên spî, zer, reş û hwd. bûne. Belkî jî di vir de mebest firişteyên ku beriya Adem û Hewa hebûne be, lê mirov nikare teqez tiştekê bibêje.

Şah Xûşîn (ew di sedsala 4'an de jiyaye û yek jî rêberên baweriya yarsan e) ku xîtebê Xatun Miye wiha dibêje; min rastî ku yek ji erkanên yarî ye da te û şert jî ku yek ji erkanê din e da kake reda ku navê meşyaneya me bi xwe re bir.

Pîr Şehriyar Hewramî jî ku di sedsala 4 û 5'ê qemerî de jiyaye, dibêje; "Ey yaran padişah û meşûqê min ji dindikê rêwasê çêbûye. Mîşiye û meşyane jî ji pelên genim hatin der, da ku alîgirên heq jî rastiya nebatê ya rast biceribîne."

Her wiha kilama yarî ji çêbûna însan ji her zayendê işaret bi "Gasenbar" dike. 'Di Avestayê de Gahenbar e. Ev roj wek cejn tê pîrozkirin ku li gor Avestayê çêbûna gerdûn û însanan di şeş rojên Gahenbarê de ye. '

Xelîfe Emir wê wiha behsa çêbûnê bike: "Ez li Reşê hatim dinyayê. Ez ê niha ji we re qala paşeroja xwe bikim, li Dîcorê dema ku tarîtî li ser gerdûnê mutleq bû, navê min Mîçeş bû. Beriya xuliqandina mirovahiyê navê min Zarkeş bû û beşdarî qalibê Maçîn (Jin) ê bûm."

Li vir her yek behsa navê Dîcorî û her wiha beriya Adem û Hewa dike. Her du jî xwe di qalibên pêkhatî yê (Maçîn) û (Hewa) ku her du jî xwedî zayenda jin in, şerîk dibînin. Û bi vî rengî cih û rola jinê ya di nav ola yarî de heya zemanekî pir dûr, yanî heya beriya Adem dibin.

Pir balkêş e ku di vir de jin ji beriya zilam û hevrêya wî, her wiha di heman tewazûnê de tê girtin, heta di mînaka ku em ê niha bidin de jî ku qala dema Adem û Hewa dike, wê bê dîtin ku mêr ji jinê dixuliqe.

Xelîfe Cebar: "Dema ku qalibê Adem û Hewa hat çêkirin, bi lêdana muzîka defê can ket bedenê wan û dest bi tevgerê kir. Piştî ku me qalibê Maçîn lê kir, te ji bo cot û hemraza wê Çîn (Zilam) xuliqand.

Xelîfe Ezîz jî dema qala diya xwe dike, dide diyarkirin ku diya wê (Altûn) beriya Hewa hatiye xuliqandin û dibêje me qalibê Hewa çêkiriye. Her wiha Xelîfe Mohemmed jî dayika xwe (Mercan) dema dide nasîn, dibêje ku ew beriya Adem û Hewa hebûye.

Girîng e ku di pêşengên ola yarî de dema behsa xwe dikin an jî xwe didin nasîn, ewilî bi nasîna diya xwe dest pê dikin û koka xwe beriya Adem û Hewa destnîşan dikin. Ger em sedsalên ku qalê dikin bigirin ber çavan, di gelek ol û baweriyan de danasîna dayikê li aliyekî, qet qala wê jî nayê kirin. Ango xwe ne bi dayikê lê bi bav didin nasîn, lê di ola yarî de xwenasandina bi dayikê, pir girîn e...

*(Didome)*



# Vê hefteyê jî dora rojnamegeran bû!

Dora binçavkirina kurdan gihîşt rojnamegerên ku li Wanê avêtina ji helîkopterê du welatiyan derxistin holê. Polîsan bi ser malên rojnamegeran de girt û ew binçav kirin. Rojnameger piştî hefteyekê hatin girtin

Di meha îlonê de li navçeya Şaxê ya Wanê leşkerên ku derketibûn operasyonê û welatiyên bi navê Servet Tûrgût û Osman Şiban binçav kiribûn û ji helîkopterê avêtibûn. Tûrgût, piştî tedawiya 20 rojan jiyana xwe ji dest da û Şiban ku bi Tûrgût re ji helîkopterê hatibû avêtin jî hê bi ser hişê xwe nehatiye û nikare îşkenceya ku li wan hatiye kirin bîne ziman.

Rojnamegerên ku bûyer derxistin holê bûn hedefa operasyonên siyasî yên li hemberî kurdan. Di 6'ê cotmehê de polîsan bi ser buroya Ajansa Mezopotamyayê ya li Wanê û malên nûçegîhanên wê Adnan Bîlen û Cemîl Ûgûr; nûçegîhana Jinnewsê Şehrîban Abî, rojnameger Nazan Sala, berhevkarên rojnameya Yenî Yaşamê Fehîm Erçetîn û Şukran Erdem de girtin û ew binçavkirin. Her çar rojnameger piştî hefteykê bi hinceta 'endamên rêxistinê ne'hatin girtin û ew şandin girtîgehê.

**Dozger heman dozger e**

Heta 24 saetan destûr nehat dayîn ku parêzer bi rojnamegeran hevdîtin bikin. Piştre derket holê ku dozgerê qaşo der barê avêtina ji helikopterê ya Tûrgût û Şiban de lêpirsîn daye destpêkirin û dozgerê ku biryara binçavkirina rojnamegeran daye heman dozger e.

Her wiha parlamentera HDP'ê Şevîn Çoşkûn jî derbarê zextên li ser rojnamegeran raporek weşand û ragihand ku di nav 3 mehan de 130 rojnameger hatine darizandin û 50 sal zêdetir ceza li rojnamegeran hatiye birîn.

**Dayikên aştiyê jî binçav kirin**

Ji bilî rojnamegeran, di nav hefteyê de li bajarên mîna Amed, Riha, Agirî, Sêrt, Şirnex û Antalyayê jî bi ser malan de hat girtin. Di van serdegirtinan de polîsan 3 dayikên aştiyê jî di nav de, bi dehan kes binçav kirin.

Rojek piştî van her du operasyonan li Stenbolê jî li hemberî Partiya Sosyalîst a Bindestan (ESP) û Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst (SGDF) operasyonek pêk hat. Polîsan di vê operasyonê de jî Hevserokên ESP û SGDF'ê jî di nav de 7 kesî binçav kirin.

**Hevşaredar Alaca girtin**

Ji bilî van operasyonên ku di nav hefteyê de pêk hatin, Hevşaredara Qersê Şevîn Alaca jî di nav de, piraniya 21 kesên ku hefteya borî hatibûn binçavkirin, hatin girtin.





# Spartina axa wî jê re pir dîtin

Navenda Nûçeyan

Li girtîgehên bakurê Kurdistanê mirina girtiyên siyasî didome. Piştî 3 girtiyên siyasî yên li Wan û Agiriyê jiyana xwe ji dest dabûn, xebereke mirina girtiyê siyasî ji bajarê Gurgumê hat. Girtî Mûhammed Emîr ku li Girtîgeha Tîpa E ya Elbistanê girtîbû, li girtîgehê bi vîrûsa koronayê ket û li Nexweşaneya Dewletê ya Elbistanê jiyana xwe ji dest da. Cenazeyê Emîr ji bo otopsiyê şandin Saziya Tipa Edlî (ATK) ya Stenbolê.

Emîr ji bajarê Efrînê yê rojavayê Kurdistanê bû û 28 sal bûn ji doza PKK'ê girtî bû. Li gel ku malbata Emîr a li Şehbayê daxwaz kir ku cenazeyê kurê wan radestî wan bê kirin jî dewlet nêzî vê yekê nebû û cenaze radestî malbatê nekir.

**Girtîgeha xapandinê**

Der barê veşartina cenazeyê Emîr de jî ji aliyê rayedarên dewletê ve agahiyên nezelal hatin parvekirin. Rayedaran destpêkê bi rêya hin parlamenteran ji Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) re ragihandin ku cenazeyê Emîr li goristaneke bêkesan hatiye veşartin.

Tenê rojek piştî vê agahiyê, rêveberiya Girtîgeha Elbistanê li vasiyê Mûhammed Emîr, Bekir Kara geriyan û jê xwestin ku di nav 3 rojan de cenazeyê Mûhammed Emîr ji Saziya Tipa Edlî (ATK) ya Stenbolê bê girtin. Her wiha ji vasî Kara re got heke cenazeyê Mûhammed Emîr di nav 3 rojan de neyê girtin dê li goristana bêkesan bê veşartin.

**Li Stenbolê hat veşartin**

Ji ber van zextan vasiyê Mûhammed Emîr Bekir Kara cenazeyê wî girt û li Stenbolê veşart. Piştî mirina Mûhammed Emîr heyetek çû Girtîgeha Tîpa E ya Elbistanê û derxist holê ku hemû girtiyên li koxûşên zilaman bi vîrûsa koronayê ketine û rewşa hinekan ji wan giran e.

**Birina rojeva meclisê**

Parlamenterên HDP'ê Şevîn Çoşkûn û Pero Dundar mirina Emîr birin rojeva meclisê û bi daxwaza ku Wezîrê Edaletê Abdulhamît Gul bibersivîne pêşnûmepirs dan Serokatiya Meclisê. Her du parlamenteran jî der barê mirina Emîr û rewşa vîrûsa koronayê ya li Girtîgeha Elbistanê de pirs ji Wezîrê Gul kirin û daxwazkirin ku der barê mijarê de daxuyaniyek bide û raya giştî agahdar bike.



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Hedefa komployê gelê kurd e

Bi ser dagirkeriya Serêkanî û Girê Spî de, salek derbas bû. Di nav vê salê de gelek bûyer û pêşveçûnên dagirkeriya dewlata tirk neheq derdixin hatin jiyîn.

Ji ber navê êrîşê, êrîşa dagirkeriyê ye, ne gengaz e ku tu aliyên wê yên mafdar hebin, lê em ji bîr nekin û roja êrîşên dagirkeriyê dest pê kiriye, yanî roja 9'ê Cotmehê ne rojek ji rêzê ye. Ev roj bi zanebûn hatiye hilbijartin û bi vê yekê dixwazin peyam bidin kurdan.

Çawa ku di 9'ê Cotmeha 1998'an de ji bo rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji Sûriyeyê derkeve, komploya navneteweyî hat destpêkirin niha jî heman dewletên di komplaya 9'ê Cotmehê de cihê xwe digirin ji bo gelê kurd ji rojavayê Sûriyeyê derxin, dest dan hev.

Ger erêkirina dewletên navneteweyî û bi taybetî dewletên ku di bin sîwana NATO'yê de kom bûne ev êrîş erê kiribûna dewleta tirk nekarî êrîşê herêmên ku gelê sivîl lê dijî bikira, lê ji ber ku li ser qirkirina kurdan li hev kirine û li ruxmî dizanin ev êrîşên dewleta tirk li gorî qanûna navneteweyî sûcî ji kesî dengê xwe nekir. Hin aliyan ji bo wijdanê xwe rehet bikin, kêm be jî bi awayekî lewaz dengê xwe bilind kirin, lê ev nayê wateya ku êrîşên dewleta tirk bi temamî red ango qebûl nakin.

Di van êrîşan de bi temamî hedef gelê sivîl bû. Di serî de Amarîka ku ji hêzên koalîsyona navneteweyî re pêşengiyê dike û Rûsya ji van êrîşan hayedar bûn. Li ruxmî dizanin ku herêma dewleta dagirker a tirk dixwaze êrîş bike bi temamî herêmê ji gelê sivîl pêk tê jî ji bo pêşîgirtina van êrîşan bigirin qet tişt nekirin. Niha jî hem Amerîka hem jî Rûsya li herêmê xwe wek hêzên aştiyê dibînin û ji bo qaşo pêşiya êrîşên din bigirin dem bi dem dewriye dikin. Ev tiyatroya senarîstê wê Amerîka, Rûsya û Tirkiye ye, diyar e li xweşa wan çûye. Lewma dem bi dem vê bi bir tînin û ji bo li herêmê xwe hîn pirtir bi cih bikin li ser senaryoyên cuda jî bi awayekî hevkar di nav kar de ne.

Gelê Bakur û Rohilatê Sûriyeyê ji bo pêşî li vê êrîşa hovane bigirin û bala qada navneteweyî bikşînin ser bûyerên li herêmê diqewime rabûn ser piya, lê dewlata tirk a îcazeya êrîşan ji heman hêzên navneteweyî girtîbû, bi awayekî çavsorî li herêmên Dêrik, Qamişlo, Amûdê, Girkê Legê, Dirbesiyê, Kobanê, Tirbespiyê, Minbic û Til Temirê jî qadên kesên sivîl lê dijîn bi balafirên şer bombebaran kirin.

Di êrîşên dewleta tirk ên bi çekên qedexekirî pêk dihatin de, 340 kesan jiyana xwe ji dest da û 945 kes jî birîndar bûn. Di şerê Serêkaniyê de dîmenê ku qet ji bîra mirov naçe û êdî bû sembola hovitiya dewleta tirk a li ser gelê herêmê bi kar tîne dîmenê Mihemedê 14 Salî bû. Di heman êrîşa çekên fosforê de 33 kes bi giranî birîndar bûn û laşên wan şewitî. Yek ji van jî Mihemed bû ku qêrîna wî ya li pêşberî kamerayan mîna xencerek sorkirî li dilê mirovahiyê ket.

Bêguman di van êrîşan de sereke sûcdar dewleta tirk e, lê hemû dewletên herêmî û yên navneteweyî ku îro li ser parzemîna Sûriyeyê li gor berjewendiyên di nav hebûnên qirêj de ne, vê hovîtiya dewleta tirk nabînin. Ji bo wan a giring ew ku berjewendiyên wan in. Pêwist e gelê kurd ji qedera xwe nexe destê van hêzên ji derveyî berjewendiyên xwe wêdetir li tiştekî din nafikirin.

Êrîşên li ser herêmê ne bi biryara dewleta tirk tenê pêk hatiye. Her çiqas daxwaz û xwesteka dewleta tirk êrîşkirina herêmên kurd be jî, di van êrîşan de yên desthilatdariya Erdogan xurt û tehrîk dikin hin hêzên navneteweyî ne.

Li ruxmî hemû kes dizanin ku dewleta tirk bi çeteyên terorîst re kar dike, wan dihewîne û xwedî dike, ji bo wan çekan peyda dike û alîkariya lojistîk dide jî kes dengê xwe nake. Ji ber van êrîşên dewleta tirk ve ew jî feyde digirin. Amarîka û Rûsya di nav de gelek hêzên navneteweyî ji bo xwe li herêmê bi cih bikin ewlekariya herêmê û êrîşên li ser herêmê çêdibin ji xwe re kirin hecet. Lewma ger ev tehlûke ji holê rabe wê demê habûna wan ya li herêmê jî bêwate dibe. Ji bo hebûna xwe bêwate nekin çavê xwe li êrîşan digirin.

Li ser êrîşên dewleta tirk salek derbas bû. Di nav vê salê de gelê Serêkanî û Girê Spî niha di bin şert û mercên pir zehmet de li kampa jiyana xwe didomînin. Ev kes li ser axa welatê xwe mîna penaberan dijîn. Yên van ji bo gelê kurd rewa dibînin niha xwe wek alîgirê gelê kurd didin nîşandan, lê pêwist e gelê kurd ji bîr neke ku heman hêzên komploya navnetewî ya li hemberî rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a di sala 1998'an de dabûn despêkirin hiştibûn ku ew ji Sûriyeyê derkeve, niha jî di roja komploya navneteweyî de dest pê kirye dixwazin gelê kurd ji welatê wî derxin. Lewma, çi dibe bila bibe pêwist e em li axa xwe û hebûna xwe xwedî derkevin. Encax em bi vî awayî em dikarin komplo û komplogeran vala derbixin. Ev yek jî bi yekîtî û yekrêziyê pêk tê.

## MALZAROKA HUNERA MIN AXAFTINA PÎRA MIN E

# Hêza me ji pirrengiyê tê

→ Bêrîvan Kayi

Muzîka me wek keştiya Nûh e; malzaroka çanda gelan e ku ev çend sal in tê jibîrkirin, asîmîlekirin û xapandin. Gelo çima ez dibêjim 'tê xapandin'? Ji ber ku rêbaza ewil a asîmîlekirinê 'xapandina hestan, xapandina fikr û ramanan e, jibîrkirina paşeroj pêşêroja nifşan e'



*Hin stranbêj hene, bi stran û afirîneriya xwe di dilê mirovan de cih digirin. Em dikarin bêjin sedema vê yekê jî şêwaza stranbêjiya resen û muzîka ku her xelekeke wê bi çanda pirreng ve girêdayî ye. Yek ji van kesan Vedat Yildirim e ku ji sala 1993'yan ve bi ked û lêgerîna xwe, stranbêjiya xwe bi gelek ziman û gelek şêwazên muzîkê yên cuda dike. Yildirim di damezrîna komên Kardeş Turkuler û Bajar de cih girtiye ku di her straneke wan de ahenga çanda kevnar û ya nûjen heye. Ji bo agahiyên berfirehtir, vê hefteyê em bi stranbêj Vedat Yildirim re axivîn.*

***Ji 'Kardeş Turkuler' heta 'Bajar', Vedat Yildirim di rêwîtiya xwe ya 28 salan de, bi hesteke çawa diafrînerîne?***

Ez ji kurdên Anatoliya Navîn im. Eşîrên me ji beriya sêsed salan ji Semsûrê hatine Enguriyê (Ankara). Gundên me li peravê Qizilirmaxê ne. Ji xeynî gundên kurdan, gundên tatar, tirkmen û ebdalan jî li der û dora me bûn. Ango min pirçandiya vî welatî, ji zaroktiyê heta niha zehf tam kir û hîn jî dikim. Ev bîst û heşt sal in ez hest û ramanên xwe mîna mêşên gerok ji rengîniya çand û zimanan werdigirim û hiltînim; hêza min ev e.

***Bajar bi albûma 'Nêz be' di sala 2009'an de bi şêwaza muzîka rockê dest bi mûzîkê kir. Çima we navekî wek 'Bajar' tercîh kir? Qey kurd êdî bajarî ne?***

Rast e. Hin kes heyîrî dimînin ji ber ku li Kurdistanê peyva 'bajarî' tê wateya pozbilindiyê jî. Hin guhdarên me dibêjin 'yaw ez ji stranên we hez dikim lê navê we çima bajar e, ma em gundî ne'. Em jî dibêjin 'navê koma me ne 'Bajarî' ye, 'Bajar' e. Em behsa jiyana bajaran dikin. Ji ber ku piştî 1990'î ji ber şerê qirêj, gelek însanên me gundên xwe terk kirin û hatin metropolan. Nifşên nû piranî li bajaran dijîn û di bin bandora çandeke tevlihev de ne. Sedema navê koma me ev e.

***Di navbera şêwaza stranên Kardeş Turkuler û Bajar de, tê xuyakirin ku tîpolojiya kesan a di stranan de guheriye. Sedema vê guherînê çi ye?***

Armanca Kardeş Turkuler (stranên hevratî) parastina çand û zimanên gelên vê axê ye. Piranî stranên ku tên şîrovekirin gelêrî ne. Awaz û beste jî hene lê kêm in. Koma Bajar gotin û awazan bixwe diafirîne û ji ber vê jî naveroka besteyan berfireh e. Li ser mijar û tîpolojiyên bajaran disekine. Ne tenê tîpolojiyên kurd, tirk, ereb, ermen û hwd jî… Slogana me ev e: 'Ava Feratê tev li Marmarayê bû' û ev hewldan hîn jî berdewam e. Kanê helbestvanekî navdar jî dipirsiya: 'Ey bajar wê tu ji me re çi bêjî.'

***Ji dans û muzîkên çerkez, mirtib, elewî, tirkmen, ermen û kurdan heta gelek çandên ku li Rojhilata Navîn hene, hûn bi zimanê wan stran û kareografiyên xwe amade dikin. Qey muzîka we 'keştiya Nûh' e? Dê mûzîk çiqasî dikaribe çandên qedîm biparêze?***

Erê tu rast dibêjî. Muzîka me wek keştiya Nûh e; malzaroka çanda gelan e ku ev çend sal in tê jibîrkirin, asîmîlekirin û xapandin. Gelo çima ez dibêjim 'tê xapandin'. Ji ber ku rêbaza ewil a asîmîlekirinê 'xapandina hestan e, xapandina fikr û ramanan e, jibîrkirina paşeroj û pêşêroja nifşan e…'

***Her wiha bi Kardeş Turkuler, we çandeke kolektîv jî di muzîkê de ava kir. Girîngiya çanda kolektîvîv, ji bo muzîkê çi ye?***

Belê, sehneya Kardeş Turkulerê ji bo gelan platformek e. Bi taybetî jî konserên ku li Stenbol Harbiye Açikhavayê hatine lidarxistin, dibûn mala hemû gel û çandan, kêmaran. Mixabin vî cihî êdî nadin me, didin 'yandaş'an!

Ji bilî vê em endamên BGST'ê (Bogaziçi Gosteri Sanatları Toplulugu) ne. BGST di warê muzîk, şano, dans û weşanên pirtûkan de berheman diafirîne û parve dike. Armanca me ya ewil kolektîvîzm e, edelet e, afirandinên berfireh e…

***Hûn bi rêzikên "Em şopa dîroka xwe têxin tûrik dev girê din/hemû kilam û çîrokan bernedin ha bernedin" dest bi strana 'Tûrikê Derwêş' dikin. Derwêşî lêgerîn û wateyê di xwe de dihewîne. Di tûrikê stranbêjên niha de, li gorî te barek çawa heye?***

Ji ber qedexekirina zimanê kurdî, di nav gelê me de xwendin û nivîsandin bi pêş neketiye. Loma jî naverokên sohbetên di navbera kurdên me de ne dewlemend in. Peyvên me her diçe kêm dibin. Em li malê kurdî xeber didin lê li derve dev ji zimanê dayikê berdidin. Ev pirsgirêk ji bo hunermandan jî berdewam e. Em bi tirkî difikirin bi kurdî dinivîsin. Divê navbera gotin û stayla mûzîkê de (rock, rap, pop hwd…) ahengek hebe.

Ger deng nûjen be divê gotin jî nûjen bin.

***Muzîka rocka kurdî bi Koma Wetan dest pê kir û bi komên wekî Tîpî Zanko Suleymanî û Tîpî Xanzad rocka kurdî berdewam kir. Ji salên nodî vir ve jî ji Koma Rewşen, Sîya Şevê, Ferec û hwd. heta roja me berdewam e. Bajar jî niha şêwaza xwe wekî 'rocka alternatîf' pênase dike. Tu rewşa rocka kurdî ya niha çawa dinirxînî?***

Berhemên xweş û germ û dilovan zehf in, lê Mixabin derfetên muzîkjenên kurdan kêm in. Ji aliyekî ve nijadperestî û cudatî li ber me bendeke ku nahêle stranên me li kolanên bajarên rojava (Stenbol, İzmir, Mêrsîn hwd.) belav bibin; li aliyê din jî bêsektoriya muzîka kurdî ye. Ji ber ku bûrjûwayên me ne neteweyî ne, pereyên xwe bo çanda kurdan xerc nakin. Wek mînak, li Stenbolê xwediyên gelek kûlûbên muzîkê kurd in lê komên kurdan dernaxînin ser dikan.

***Di 28 salên xwe yên muzîkê de, tu bi gelek hunermend û stranbêjan re derketî ser dikê; te bi gelek zimanan stran gotin û tu hê jî dibêjî. Yanî di serboriya te ya hunerê de tim xwenûkirinek an jî lêgerînek heye. Vê yekê heta niha hêzeke çawa daye Vedat Yildirim?***

Xwenûkirin karekî pir zehmet e. Divê mirov her roj hewl bide û bi pêş bikeve; hînkirin wek zarokan, bi dilekî ciwan. Ji aliyekî din ve jî divê mirov xwedî wîjdan be…

***Di jiyana te de, çi ye bûyera herî zêde li te bandor kiriye?***

Bi rastî serpêhatî û bûyerên ku hatine serê min pir in, lê niha tiştekî ku wekî mînak ji te re bibêjim nayê bîra min. Li min biborin. Ez dikarim di vê der barê de wiha bêjim ku periya afirîneriya min pîra min e. Navê wê Edûl e. Rîtima axaftina wê mîna ava aram malzaroka hunera min e.

***Mizgîniya xebateke te ya nû heye? Ger hebe dikarî qala naveroka wê ji me re bikî?***

Rast e, hin xebatên me hene lê ji ber pandemiyê em nikarin zêde werin cem hev. Ev li ber karê me astengiyeke mezin e. Dîsa jî xebatên me berdewam in. Koma Bajar niha li ser fîlmekî dixebite. Em dixwazin soundtracka vî fîlmî jî derxînin. Ji Xeynî wan, di vê meha cotmehê de li ser youtubeyê dê konsera Bajar were weşandin.





### Vedat Yildirim kî ye?



Di sala 1970'yî de li gundê bi navê Kesîk Koprû yê girêdayî Enqereyê hatiye dinê. Di nav malbateke qerebalix de jiyaye. Piştî ku dest bi dibistanê dike zimanê tirkî hîn dibe. Di 1993'yan de dema li Zanîngeha Bogazîçiyê Beşa Karsaziyê dixwîne dest bi muzîkê dike. Di vê salê de jî bi projeya Kardeş Turkuler dest bi mûzîkê dike. Di sala 2009'an de Koma Bajar dadimezirîne û heta niha jî bi gelek stranbêjên cuda re xebitiye û xebatên wî hê jî didomin.

# Siyabend an jî qeder'

Ji Delav



Feratê Dengizî

**Mijara tolhildana ji qederê di çîroka Siyamend (Siyabend) û Xecê de pir bala min dikşîne û ez serê xwe li ser pir diêşînim. Siyamend dibêje felekê yan jî qederê bavê min kuştiye, ez ê herim heyfa wî hilînim**

Siyabend, Siyamend, Sîehmed... Siyabend û Xecê, çîrokek çîrok-kilamek bi nav û deng a welat û civaka me ye. Nizanim ji ku dest pê bikim (.) Lê ez a dilê xwe ji serî de bibêjim; naveroka vê destanê bala min gelekî dikişîne û ez serê xwe li ser pir diêşînim. Çawa mirovek diwêre bibêje "ez ê li qederê, li felekê bigerim û heyfa xwe jê hilînim!" Ev tiştekî pir balkêş e. Dem û dewrana wê jî balkêş e.

Ev çi wêrekî ye?

Ev navdixwedan, qaqibo ne tiştekî ketûber e. Nexasim li Rojhilata Navîn, li civaka kurd a pir bi qeder, bawerî û ruhiyetê ve girêdayî ye. Dema wê jî kevn xuya ye.

Nizanim; di wêjeya cîhanê de tiştekî wisa heye gelo? Cahiliya min bibexşînin!

Belkî hûn bibêjin ev ehmeqî yan jî tiştekî ketûber e, lê bi ya min na! Aliyekî felsefîk ê kûr û şopên çînî, nexasim ên neteweyî jî tê de hene. Mirov divê li ser kûr û dûr bifikire.

Jêder hene. Jêder bêtir dengbêj in. Her yekî li gorî herêma xwe şêwe dayiyê, lê hin tiştên bingehîn hene û bingeha sereke lêgerîna li qederê, li felekê û ji bo heyfhilanînê ye.

Pêşî dixwazim rewşa çend vegotinên dastanê rave bikim.

*Dengbêj Mistefa bi kilamî dibêje; "Siyabend zû sêwî dimîne, li ber destê Ap û Apojinê bi perîşanî dijî. Paşê dibe golikvan, lingê golika pîrekê dişikîne û terkîdiyar dibe. Xocê Xizir tê xewnê, dibêje: Tu Siyabendê Silîvî yî û xwediyê hesp, şûr û mertalan î. Siyabend jî dibêje: Li gel ku felekê yan qederê bavê min kuştiye, ez ê herim heyfa wî hilînim…" û kilam wekî gelek agahiyên ku me bi dest xistine didome.

**Dengbêj Sidiqê Qarliova**

Dengbêj jî bi kilamê diherikîne destanê: "Xecê û Siyabend meraqliyê hev bûn. Heft salan li dû hev geriyan. Xwedê Teala nesîbê wan gihand hev. Siyabend Xecê revand, bir serê çiyayê Sîpanê Xelatê. Serê xwe li ser çoka Xecê danî û got: Xecê xewa min tê. Ez ê hinekî rakevim û paşê rabim em ê derdê xwe ji hevdu re bibêjin." Û destan didome. Hin guherto wiha ne. Xecê dibêje: "Gakovî ji te jêhatîtir bû." Îcar Siyabend pesnê xwe dide û li ser vê gotina Xecê bi pey gakovî dikeve. Li vê derê başbazirgan Hecî Bedirxan Beg e, dost û birakê wî; Qeregêtiran, hespê wî; Demîrqirê Şêr e.

*Dengbêj Hecî Izêrê Dengizî wek guhertoya Sûrgiciyan dibêje; "Sîehmedê Silîvî û Xeca Bir(l)îvî…Sîehmed û Xeca Birîvî" Birîva gundekî herêma Dêrevera ya Stewrê ye. Qala Şikakiya Xecê nake. Kilam û vegotina meseleyê ji serê Sîpan dest pê dike… Wekî din jî dişibe guhertoya (wersiyona) Serhedê ya ku Ahmet Aras ji Dengbêj Sebrîkoyê Xellêyî (ku ji gundê Xellê ye) û Hisênê Bilokî (2)..

*Nivîskar Adar Jiyan qal dike û wiha dibêje: "Xortekî qeşeng û çalak e. Nêçîrvan e. Di qontara çiyayê Sîpanê Xelatê de nêçîrê dike.

Navê wî Siyabend e. Bi eslê xwe Silîvî ye. Her kes wî wekî Siyabendê Silîvî dinase. Siyabend, di nav nêçîrvanan de xortê her bedew, dilsoz û dilawer e. Dilê wî dikeve Xecê. Xecê jî keçeke heta bê bes bedew e. Bedewiya wê bi nav û deng e. Yên Xecê dibînin, ji xweşikiya wê pêv qala tiştekî din nakin.

Ji zû de, dilê Siyabend Xecê girtiye. Bêyî wê, hedana wî nayê, tebata wî nabe. Dilê wî heye Xecê bixwaze. Xortekî lihevhatî, qeşeng û mêrxas e. Belê lihevhatîbûn û mêrxasiya wî ji bo xwestina Xecê ne bes e. Ji ber ku li wê herêmê tu jin, bi xweşikiya xwe nikarin lingê xwe li lingê Xecê bixin; qelenê wê pir giran e…" di berdewamiyê de diyar dibe ku dilê Xecê jî bi ser Siyabend ve ye, lê mala feqîriyê xera bibe… Û hevdu direvînin, derdikevin serê Sîpanê Xelatê. Vegotin ji vira û pê ve dişibe destana ku em dizanin. Wek ku Adar Jiyan destan rojane kiriye.

**Adar Jiyan ev guherto girtiye:**

"Siyabend nêçîrvanekî bi tîrkevan î sivik bû

Mêrekî bi sed mêran bû

Evîndarê Xecê bû

Xecê xwişka heft bira, dotmama dozdeh pismaman bû

Dema ku evîna herdu evîndaran di nav êlê de bela bû

Bavê Xecê, berî ku bira û pismam evîna Xecê bibihîsin rabû

Ji bo ku her du evîndaran nekujin li meselê dabû

Nîkaha wan li ba melê birî bêyî bira bû

Berî ku bira û pismam bibihîsin berê wan dabû

Sîpanê Xelatê jê pêv tu çare nemabû

Rojekê Siyabend li bin siya darekê dikeve xew. Kalekî rîspî di xewna xwe de dibîne. Kalo, dibêje: "Tu yê bibî pêlewanekî hêja û li vê herêmê navûdeng vedî. Belê dê dostekî te çêbibe, û dê ew jî dostê te jî bibe pêlewanekî mîna te. Hûn ê destê xwe bidin hev û pevre bigerin. Her wiha hûn ê li hemberî kesên neheq û zilmdar şer bikin. Dê ew dostê te, qet ji gotina te dernekeve û dê tim bi ya te bike." Destan li ser vê şêweyê didome. Lavayiya Pîrê wek guhertoyên din e. (3) Lê wek ku ji belayê revîn, lê belayê jênegerîn dide zanîn ku ew wek gelek mîtolojiyan e. (4) Dîsa navê leheng, hesp, şûr di vê vegotinê de nîn e.

**Di Sînemayê de ev çîrok**

Di 1992'yan de li ser "Destana Siyabend û Xecê" filmekî sînemayê hate kişandin (çêkirin). Senarîstê wî Husyîn Erdem, derhênerê wî Şahîn Gok bû. Li ser navê Siyabend Tarik Akan û li ser navê Xecê jî Mîne Çayiroolu dilîstin.

Ji ber ku min fîlm temaşe nekiriye, ez ê fîlm rave nekim.

**II**

**Pirtûka Ahmet Arasî**

*Siyabend û Xecê ya Ahmet Arasî; wek pirtûk hatiye çapkirin. Di pêşgotinê de wisa dibêje; "…Min ev destana ji Sebrîkoyê gundê Xellê girt. Gundê wî li ser navçeya Milazgirê ye…"

Tiştên ku di pirtûka Arasî de derdikevin pêş ev in. Siyabend wek ku dibêje: "Bela hate serê min; min nedixwest belê ji ber wê jî nereviyam." Peyva "Roja ku sed û yek bela nîn bin, ew ne roj e" "Qeda serê sibê bela êvarê me" yanî dixwaze bibêje, belayê hat ez dîtim. Bi vê şêweyê rewşa Babek û Şêx Bedrettîn tîne bîra mirov. Lêgerîna felekê tiştekî razber e. Bi saya Qedê û rewşa şênber armanc hinekî biguhere jî, berê xwe didin alîkarê wê (Rp.20). Dîsa armanc felek û tolhildan e…

Dixwazim çend têbiniyên Arasî parve bikim;

•"Ez dawiya havîna 1971'ê de li Şamê bi Îzet Axayê Dêrikî ra hevnas bûm. Xalê Îzet (Bavê Reşat) ji folklora kurdî haydar bû. Me li ser destana Siyabendê Silîvî jî sohbet kir. Xalê Îzet digot: 'Birango, zanî di vê destanê de tiştê ku bala min dikişîne çi ye? Serhişkiya mêrxasê me ye. Mêrxasiya Terzê Kurdî… Mêrxasê me ketiye pey felekê, şerê felekê kiriye."(Rp.5)

•"Ap û amojinê mîna dijminan rika xwe kutabûnê, nedihiştin ku Siyabend serê xwe bilind bike… Siyabend…. got: Xwezî ez însan nebûma yek ji wan kûçikan bûma. Ev çi bextê nebaş, ev çi qedera reş e ku bûye para min! Gelo kê ev qedera reş kiriye para min?...

Carcaran Siyabend ku diçû nav gund, dilê jinên cînaran pê dişewitî, digirtin kerîk nan didanê. Paşê ji hev re digotin: Lêlê xwengê, felekê çerxa wî ters zivirandiye, qedera wî reş kiriye. Kî dikare qedera wî biguherîne? Em çi bikin!" (Rp.7-8)

•"Şivan got: Felekê qedera te reş kiriye kurê min!"(Rp.13)

•"Siyabend ji gund qetiya;

Li Hêşînboz siyar bû Siyabendê Silê,

Li pişta xwe girêda Lahorê Qetlê,

Berê xwe da Welatê Serhedê,

Bi hêrs û gef kete pey Felekê.

Got: "Berî ez destbirakê xwe bibînim,

Em ê lê bigerin, wê li cîkî biqefilînin,

Heyfên kevn û teze jê hilînin,

Merama dilê xwe bi cî bînim."

Siyabend di rê de lezand,

Riya heft rojan di rojekê de qedand,

Menzîla dirêj zêde nekudand,

Xwe bi Geliyê Bidlîsê re gihand. (rp.17)

-Qedê got: "Bira kî ye ew dijminê xayîn?"

Siyabend got: "Felek e!"(Rp.20)

-Qedê got: "Mekrûme bela, hemî tu li ecelê xwe digerî, erê min dît. Li Mêrga Gulistanê kenekî mezin ê terikandî vegirtiye. Dûyekî zirav jê dikişe ; herhal ev kon, konê felekê ye."

Siyabend bi dengekî bilind got: "Wele eva hema konê Felekê ye; felek bixwe jî tê de ye." Û ew kon, konê Xecê bixwe ye! Di xewna xwe de Xocê Xizir dibîne; ew rewşa wî tîne ziman, jê re hesp, şûr û mertal tîne. Navê hespê wî; Heşînbozê Surê, navê şûrê wî; Lahorê Qetlê, navê hevalê wî; Qedê- Qedeqêtiranê Salê, Kurê Hemê û Zemê ye. Navê Qedegêtran balkêş e, yanî tim qezayê (qedayê) tîne. Her sal qedayekê tîne; Qede+gêtran(Ji tirkî niziliye)+ ê salê (di salê de tim qedayî wî hene). Ev yek wekî biwijekê derbasî zimanê kurdî û her wiha çanda kurdî bûye. Wekî nimûne; ji bo kesekî nehs ê ku mirovan aciz dike re dibêjin: "Qeda bi te keve!" an jî, bila qeda bi te bikeve qey ku aqilê te were serê te."

Rewşa kûviyan û ya jinê ya li Sîpan jî hêjayî nirxandinê ye. Ev bûyer rewşa jinê û nêrîna civakê li ber çavan radixe; ku jin di civakê de çawa tên dîtin? Vêya jî wekî ku jin ajalek be; qelsî, lewazî û kêmanî jê re rewa tên dîtin. Giriyê Xecê û nêrîna wê ya li kûviyan ne tiştekî ji rêzê ye.

*Siyabend û Xecê ya Ronî War, wek roman hatiye nivîsîn.

Ji ber ku roman e, bi ya min aliyê wê yê destanî jî heye. Belê ew alî zêde ne li pêş e. Peyama lêgerîna felekê û ya tolhildanê jî di nav xumamê de maye. Nehsî û xerabiya Siyabend bêtir derketiye pêş. Helbet, ev li ser wersiyona (guhertoya) herêmê hatiye hûnandin. Siyabend, li gorî tehdeya ku ji ber xerabiya wî lê bûye û tolhildana xwe ya ji ber xisara ku ji hêla mirovan de gihîştiyê ji bo xwe wekî mafekî rewa dibîne. Helbet li vir bandora ku Xoceyê Xizir di xewna xwe de dibîne jî heye ku felek xwe bi reşbînî û rewşeke xerab şanî wan dide û hişê wan tevlihev û şolî dike. Ango wekî ku bi qedera xwe qayîl bibin…

**Çend mînak**

- Car caran axîna ji felekê, tê ser zarê Siyabend, "Felekê, xayînê çima te li min wa kir? Hey felekê, xayînê te dê û bavê min ji ber çavên min wenda kir. Te ez kirim sêwiyê ber destê zalimê ap û amojinê. Binêre serê min gurî bûye, gurîbûnê xwe berdaye heta nav pişta min. Ji ber vê zilma ap û amojina min êdî deyaxa min nema. Felekê bêbextê ma çi heqê te li min heye!" (Rp.20)

- Wexta ku Siyabend taştiya apê xwe dixwe, bangî felekê dike; "Xayînê vaye min zikê xwe bi nan û şorbê têr kir. Gelo îro mirin bi bala kê tê."(Rp.24)

- Siyabend zikê xwe ji goştê gayê sor têr kir. Bangî felekê kir û got: "Hey felekê xayînê vaye îro min carek din jî zikê xwe têr kir, kanî mirina malik xerab tê bîra kê." (Rp.30)

- "Pîrê jî kezeba kûr qêriya û bi wê hêrsê ji Siyabend re got: Lawo ez ji Xwedayê jorîn hêvî dikim ku keleşê çiyayê Sîpanê Xelatê, Qeregêtranê Salê bi ser te bişîne û bila heyfa me feqîran ji te hilîne." (Rp.95)

- Siyabend û Qeregêtran bi xewnê û saya Xocê Xizir hay ji hev dibin.

- Ya Kalê di xewnê de, ya Xoceyê Xizir, hêviya min ma xewna nîvê şevê. Qey ew ê rojekê birakê min Siyabend heyfa min ji viya hilîne li darê vê dinyayê. (Rp.103)

Dîsa lêgerîn û heyfhildana ji felekê wisa tê holê:


- Qeregêtran, ez tîr û kevanê xwe li ba kim, ez ê li erdê xim erdê bi du ciyan kim, ez ê feleka xayîn jê bi xuya kim, ez ê bipirsim bê ka çima te dê û bavê me ji me stand. Em li ber destê ap û amojinê hiştin. Ez ê vê çîrokê û vê merselê jê sewal bikim. (Rp.104-105)

- Piştî ku bi qeder-feleka wek reşikî rû bi rû dimînin, dimînin heyirî… Ew dibêje: "…. Tiştekî ku ji destê min bê tune ye. Li qedera kê çi nivîsandibe ew tê serê wan. Her kes jî diavêje stûyê min feqîra Xwedê. De vaye we felek dî, de îcar bihewin û ji xwe re vegerin lawo."(Rp.116)

Lê qeder-felek berê wan dide Mêrga Gulistanê. Li wira Xecê, Xeca Gulîsor heye..!

Navê bavê Siyabend, Qasim e, ev cudatiyeke ji guhertoyên din e. Çeka pêşî Çîpa Devê, paşê Lahorê Qetlê. Navê hespê wî Demirkiranê Xeybê ye. Hevalê wî, Qeregêtran e, ev jî wek ku ji tirkî nizilî be; Qere+gêtran, yanî reşbînî û xeterê tîne bîra mirov.

Xewn, ger û heyfa ji felekê… Xocê Xizir, gurîtî û por hatin, sir, eşîra Xecê, Şikakî, şerê bi birayên wê re û hwd… tiştên hevpar û cuda hebin jî dişibe versiyonên din… ***(didome)***







Aborî û Civak

Ramazan Tunç



# Nîşanên 2023'yan û baweriya bi piyaseyê


Ji bo hikûmeta desthildar a Tirkiyeyê nîşanên 2023'yan gelekî girîng in. Di pêvajoya çareserkirina pirsgireka kurdan de, wexta ku ji bo piyaseyê hêvî û bawerî zêde bûn, hikûmetê wek armanc diyar kiribû ku di 2023'yan de Dahata Netewî ya Giştî (DNG) bi ser 2 trilyon dolarê amerîkî bixe û Tirikiyeyê têxe nav koma 10 aboriyên herî mezin ên cîhane. Li gor hikûmetê ev nîşanên 2023'yan di heman demê de ji bo pîrozbahiya sedsala cûmhûriyetê dê xelatên mezin bûna. Li gor van armancan enflasyon û betalî gelekî kêm dibûn û DNG'ya serê kesî derdiket derdora 23-24 hezar dolarê amerîkî.


Meha îlonê meha destpêka payîzê ye û amadekariyên zivistanê di vê mehê de dest pê dikin. Ji bo pergala aborî û fînansa navnetewî jî, di heman demê de amadekariyên budçeyên hikûmetan dest pê dikin. Di vê mehê de aboriya Tirkiyeyê jî di qeyran û tengaveke mezin re derbas bû. Beriya îlonê, şoka dowîz-pereguherê di meha tebaxê de nirxê zêr û pereyên derveyî li hember perê tirk gelekî zêde kir. Moody's asta krediya (qedrê) Tirkiyeyê ji B1'ê daxist B2'yan, rewş jî wek negatîf diyar kir. Fitchê jî fikra xwe got û bal kişand ser rewşa deynê Tirkiyeyê û kêmaniya carî ya hevsenga peredayînê. Di heman demê de li Amerîkayê di der barê doza karsazê farsî Reza Zerrab de bûyerên nû qewimîn û Medyaya Azad NBC'yê bi navê dosyayên FinCen bi hezaran dokumanên der barê dosyeyê de bi destê olîgarkên wek Lev Parnas belav kirin. Bankaya Navend a Tirkiyeyê ji bo pêşiyê li zêdebûna nirxê pereguherê bigire, amûrên xwe yên neqdî xelas kir û dîsa dest avêt rêjeya faîz zêdekirinê û 200 point faîz di yek carê de zêde kir. Di nav vê geremolê de, daxistina not, ji bo Tirkiyeyê di demeke ku wezîrê karên darayî diyar kir, aboriya Tirkiyeyê ji rewşa herî xetere derketiye û ber bi başbûnê ve diçe de hat daxuyandin û bernameyeke "nû" ya din jî hat diyarkirin. Her wisa di çarçoveya hewldana başkirina aboriyê de hikûmetê zagona Fona Hebûna Tirkiyeyê nû kir û fonên teqawitiyê hemû di bin banê fonekê de kom kirin û diyar kir ku ev fon dê deyn û krediyan bide sektora taybet.

Ji 2017'an heta niha di pergala navneteweyî de, aboriyên Tirkiye, Brezîlya, Afrîkaya Başûr, Arjantînê ber bi xerabûnê ve diçin û ev welatên hanê bûne aboriyên qirofek-şikestîbar. Li gor hinek saziyên pispor, aboriya Tirkiyeyê hatiye merhaleyeke wisa ku êdî mayîndebûna fînansê ji derveyî bankaya navendî ketiye ser milên bankayên giştî yên wek Ziraat, Halk û Vakifbankê.

Ev jî tê maneya ku rewşa aboriyê ji derveyî Tirkiyeyê ve pir xetere xuya dibe. Di bernameye aboriyê ya nû de her çiqas hêviyên gelek mezin hatibin nivîsandin jî, nayê zanîn ku ev bernameya nû ya çendan e ku hat diyarkirin. Her çiqas her bernameyek rewşeke ku bihara di ber dilî re tîne, pêşkêş bike jî, rewşa aboriya Tirkiyeyê wek qemyoneke fren teqiyayî ber bi nebaşbûnê ve diçe. Li gor qanûnên Tirkiyeyê hikûmet mecbûr e ku bernameya navberî li gor plana pêşveçûnê ya neteweyî amade bike lê di 2020'an de ev berneme jî gelekî bi derengî ket û baweriya bi piyaseyan zêdetir şikest. Naveroka ku hate diyarkirin jî ti hêvî û bawerî ji piyaseyê re dernexist holê.

Di naveroka BAN'ê de gelek mijarên çewt û hedefên ku bi hişê mirovan henekan dikin hene. Mînak, li gor BAN'ê enflasyona Tirkiyeyê ew ê dakeve û di 2023'yan de bibe %4,9!. Di dema ku aboriya Tirkiyeyê di demsalên xwe yên herî baş de bû jî, enflasyon ew qas daneket û kesan xêr ji bazara ve hikûmetê nedît. Di demên peş de daketina enflasyonê gelekî zehmet û xetere xuya dibe.




Dîsa wezîrê karên darayî di daxuyaniya xwe ya BAN'ê de, li ser rewşa zêdebûna nirxê pereyên biyanî, anî ziman ku daketina nirxê pereyê tirk jî, bi qasî ku hevsengiyê bi hêsanî têk bibe, di rewşa xerab de nîn e û wan eleqedar nake. Bi ya min wezîr ji bîr kiriye ku li gor saziya statîstikan a Tirkiyeyê (TUÎK) hilberîna Tirkiyeyê ji sedî 73 girêdayî jidervestandinê ye. Jidervestandin jî girêdayî dolarê amerîkî ye ku a niha xelaya dolar li ber deriyê Tirkiyeyê ye. Lewra çiqas nirxê pereyê tirk dakeve, ew qas buhayê hilberînê zêde dibe û enflasyon li wê gorê zêde dibe.

Ne tenê enflasyon, nîşanên (hedef) BAN'ê ji bo enflasyonê çewt in, nîşanên zêdebûna dahatê, kêmaniya carî, kêmaniya budçeyê û betaliyê jî çewt in û ji bawerîdayîna piyaseyan gelekî dûr in.

Mînak endeksa baweriya zihakaran a TUÎK'ê li der dora 59 pointê diçe û tê. Eger ev endeks li ser 100'î be meyla baweriyê heye, lê mixabin ev çend sal in bi xêra manîpulasyonan jî hîn nêzî sedî nabe.

Mînak bawerî bi polîtîkayên hikûmetê hebûya, ew ê bawerî bi pereyên biyanî tune bûya ku îro li gor statîstikên Bankaya Navend a Cimûriyetê (BNC) kesên li Tirkiyeyê dijîn mevdûatên xwe wek pereyê derveyî û zêr diparêzin û dev ji pereyê tirk berdidin. Di vir de jî pereyê tirk wek amûrê berhevkirinê hêza xwe wenda dike. Heta niha BNC'ê rezervên xwe helandine û rezervên rasterast di biniya 40 bilyon (milyar) dolarê amerîkî de ne lê mevdûatên kesan derketiye 217,7 bilyon dolarî.

Kesên li derveyî Tirkiyê ne û pereyê xwe li Tirkiyeyê di DÎBS, Fon û Bonoyan de razandine jî, ji ber ku piyaseya Tirkiyeyê ne ewle ye, bi rayedaran jî baweriyê nayînin, roj bi roj ji piyaseya pere vedikişin û li welatên din sermiyanên xwe radizînin.

Hemû endeksên ku baweriyê didin piyaseyê serberjêr bûne û kesên rayedar dîsa jî pif dikin nepoxê (balon) û nepoxê tije dikin. Bi makîneya propagandayê aboriyê bi rê ve dibin. Her roj dibejên, dê sibê ji îro çêtir be. Di BAN'ê de jî tu nîşaneyeke bawerî û hêviyê ya dê piyaseyê sererast bibe, tune ye. Rewşa nîşanên 2023'yan jî bûye rewşa belengaziyê. Armanc DNG 2 trilyon bû, a niha DNG di biniya 700 bilyon dolarî de ye. Nepoxa ku tê pifdan erge biteqe, dê dengekî gelekî mezin derkeve holê. Çiqas di navê BAN'ê de "nû" hebe jî, hîkûmet ne hikûmeta ku tiştekî nû têxe meriyetê ye. Ev cara çendan e ku nav "nû" ye lê naverok ne nû ye, riziyaye. Dewlet deyndar, milet deyndar heta ber qirikê û hikûmet jî bûye dewleta bikiltûz, bel e, gewr e, bi şev sayî ye, bi roj ewr e.

**Endeksa Baweriyê (Cofidence Index):** Tê xwestin ku ev endeks di ser sedî re be. Wexta endeks li ser 100'î be tê maneya ku zihakar bi piyaseyan bawer in. Di bin 100'î de be, bawerî bi piyaseyan tune ye. Ji 2017'an şûn de li Tirkiyeyê ev endeks di bin 100'î de ye.

**DÎBS-Senedên Deyn ên Dewletê yên Hundirîn:** Dewlet ji bo peydakirina çavkaniyên budçeyê senedên deyn derdixin û li gor daxwazan ji bo wan senedan polîtîkayên aborî, fînans û darayî tên destnîşankirin. Ku bawerî bi piyaseyan zêde be, ji derve de sermiyan bi rêya porfoy û DÎBS'ê dikeve piyaseyê.

## Gotinek ji gotinên pêşiyên me

**Dewleta bikiltûz, bel e, gewr e, bi şev sayî ye, bi roj ewr e:** Ji bo rewşên berevajî ku roj bi roj ber bi xerabûnê ve diçin, tê bikaranîn. Rewşa ku rayedar bi darê zorê û çewtarî di tarîtiyê de xebatan dikin, ji zelalî û ronahiyê dûr dikevin re tê gotin.

# Krîz dewlemendan dewlemendtir dike

Li cîhanê ji ber şewbê qeyrana aboriyê dewam dike. Di rewşeke wiha de çend hezar milyarderan sermayeya xwe gelekî zêde kirin.

Li gorî lêkolîna hevpar a bankayeke Swîsreyê UBS û saziya şêwirmendiyê PWC, di navbera salên 2017 û 2020'î de hejmara milyarderên li cîhanê zêde bû. Hejmara milyarderan sala 2017'an 2 hezar û 158 bû, di tîrmeha sala 2020'î de bû 2 hezar û 189 kes.

Mijareke din a ku di lêkolînê de bal kişand ew e ku sermayeya milyarderan zêde bûye. Li gorî Bankaya Cîhanê îsal bi dehan milyon mirov xizan û birçî bûn, lê milyarderan bi1.3 trîlyon dolarî bêhtir dewlemend bûn.

Li gorî vê yekê di sala 2017'an de sermayeya giştî ya milyarderan 8 trîlyon û 900 milyar dolar bû. Ji meha adarê heta tîrmeha 2020'î ku qeyrana aboriyê mezin e, ev rêje gihîşt 10 trilyon û 300 milyar dolarî.

*CENEVRE*





## KCÊE Dayika Esmer bi bîr anî

Koordînasyona Civaka Êzidî ya li Ewropayê (KCÊE) ji bo Micewira Kaniya Spî Dayê Esmer a ku 6'ê Cotmehê çû ber dilovaniya Xwedê, bi bîr anî. Dayê Esmer 74 salî bû û ji gundê Mehatê, Welatê Şexanê bû. Dayika Esmer bi dehan salan xizmet ji êzdayetiyê û Laleşa Nûranî re kiriye. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Dadê Esmer heta dawiya temenê xwe, girêdayî bawerî û doza êzdayetiyê bû. Bi dehan salan xizmet ji êzdayetiyê û Laleşa Nûranî re kir. Di 20 salên dawî de jî, di asta herî jor de, micewirtî ji kaniya Spî û Laleşa Nûranî re kir û bi dehhezaran zarokên vê civakê mohr kirin û rêya Tawisî Melek nîşanî wan da." KCÊE diyar kir ku Parêzvan û Micewira Kaniya Spî û Tawisî Melek Dayê Esmer dayika tevahiya êzidxanê bûye û tu ferq û cudahî nexistiye navbera zarokên Êzîdxanê. Di daxuyaniyê de hat bibîrxistin ku piştî qedemguhestina Bavê Şêx Pîr Smaîl Mirad, di 6'ê cotmehê de Micewira Kaniya Spî Dayê Esmer koça dawî kir û çû ber dilovaniya xwe. *BRUKSEL*



## Kujerê Floyd bi kefaletê hat berdan

Polîsê bi navê Derek Chaûvîn ê ku 25'ê gulana 2020'an ciwanê bi navê George Floyd kuştbû, bi berdêla kefaletê hat berdan. Li gorî nûçeya New York Tîmesê ku agahiyên xwe spart parêzerê Chaûvîn, ji bo berdana Chaûvîn kelafeta pêwîst pêşkêşî dadgehê hatiye kirin. Dadger Jeannîce Redîng li ser serlêdaneke beriya niha ya polîsê kujer, hin şert diyar kir. Dadger diyar kir ku divê Chaûvîn ji eyaleta Mînnesotayê dernekeve, têkiliyê bi malbata George Floyd re daneyne û hemû çekên xwe radestî polîsan bike. Di bûyera 25'ê gulanê de, polîs Derek Chaûvîn bûbû sedema mirina George Floyd. Tevî ku Floyd digot 'bêhna min diçike' Chaûvîn 9 deqeyan çoka xwe ji ser stuyê Floyd ranekiribû. Li gorî qanûnan, Chaûvîn ji ber ku di asta duyemîn de bû sedema mirinê divê bi 40 salî, ji ber ku di asta sêyemîn de bû sedema mirinê bi 25 salan bê cezakirin. *WASHINGTON*

## *Hevdîtinan dest pê kir!*

Li gorî agahiyên ku Berdevkê Wezareta Karên Derve ya Rûsyayê Marîa Zaharova ragihand, di navbera Baku û Erîvanê de hevdîtinan dest pê kir. Hevdîtinên di navbera aliyan de bi banga Moskovê dest pê kir. Tê zanîn ku beriya hevdîtinê Serokwezîrê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn hem bi Azerbeycanê hem jî bi Ermenistanê re bi telefonê axivîbû û ew vexwendibûn Moskovê.

# Yekitî dê ji hemû gefan re bibe bersiv

Navenda Nûçeyan

**Hevserokê PYD'ê Enwer Muslîm der barê danûstandinên diyaloga kurdî de axivî û diyar kir ku li dijî hemû gefên Tirkiyeyê dê yekitî bibe bersiva herî baş**



Bi salan e gel, partî û saziyên kurdan ji bo pêkanîna yekitiya neteweyî ya kurdî li çar parçeyên Kurdistanê di nav kar û xebetan de ne, lê her gavê hewldana pêkanîna yekitiyê ji ber berjewendiyên hizbî û şexsî têk diçin û nagihîje encamê.

Sazî û partiyên kurdan ku dixwazin vê yekê pêk bînin kar û xebatên xwe didomînin. Ji ber ku aliyên kurd dixwazin yekitiyê pêk bînin, dizanin parastina destkeftiyan û bidawîkirina êrîşên li ser axa Kurdistanê pêkan e. Gavên şênber ên yekitiyê jî li rojavayê Kurdistanê di navbera partiyên kurdî de pêk hat. Ev nêzî 7 mehan e Encûmena Niştimanî ya Kurdî ya li Sûriyeyê (ENKS) û Partiyên Yekitiya Niştimanî ya Kurdî (PYNK) danûstandinên ji bo yekitiya kurdî dikin. Her du aliyan heta niha li ser nêrîna siyasî ya hevbeş û avakirina Lêvegera Kurdî ya Bilind li hev kirine.

Di rojên borî de jî Polîtburoya Partiya Demokrat a Kurdistanê – Sûriye (PDK-S) der barê danûstandin û diyalogên bi encam û teqez de daxuyanî dabûn û ev tişt diyar kiribû: "Tevî hin astengî hene lê danûstandin ji bo tevlîbûna ENKS di nav Rêveberiya Xweser de berdewam in."

**Divê kurd bibin yek**

Têkildarî diyaloga kurdî, Hevserokê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Enwer Muslîm axivî.

Hevserokê PYD'ê Enwer Muslîm ragihand ku diyaloga kurdî dê bibe bersivek ji gefên Tirkiyeyê re û diyar kir ku pêwîst e ev diyalog bi ser bikeve û aliyên kurdî bigihîjin xeta yekitiyê.

Muslîm der barê girîngiya diyaloga kurdî de diyar kir ku ji bo kurd li hember civakên navdewletî bibin yek û bikaribe zilm û zoriyên li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî tên kirin, zêdetir aşkera bikin hewce ye diyalog bi pêş bikeve.

**Bersiva herî girîng**

Muslîm axaftina xwe ya der barê diyaloga kurdî de wiha bi dawî kir: "Em bi hêvî ne PYNK û ENKS û partiyên derveyî wan bikarin yekrêzî û yekhelwestiyê pêk bînin. Dijminên gelan her dem hewl didin ku yekbûn çênebe. Bersiva herî girîng jî ew e ku em di demeke nêzîk de yekbûna xwe ava bikin."

# Tirkiye şer gur dike!

Navenda Nûçeyan

Şerê di navbera Azerbaycan û Ermenistanê de ji 27'ê îlonê ve berdewam e û bi tevlîbûna dewletên wekî Tirkiye û Rûsyayê jî her diçe bîlançoya kesên ji cih û warên xwe bar dikin û kesên tên kuştin zêdetir dibe.

Di rojên borî de serokomarê Fransayê Emmanuel Macron di civîna çapemeniyê ya Lûtkeya Yekitiya Ewropayê de gotibû ku; "Li gorî agahiyên îstîxbarata me Tirkiyeyê 300 kesên çekdarên ji Sûriyeyê, di ser Dîlokê re şandine Bakuyê. Ev tê zanîn û şopandin û tespîtkirin. Komên çekdar ên cîhadîst tên herêma Helebê. Ev yek tê wateya ku xeta sor derbas dikin."

**'Zimanê şer bi kar tîne'**

Hefteya borî Serokwezîrê Ermenistanê Nîkole Paşînyan jî ragihand ku ji ber piştgiriya dewleta tirk a ji bo Azerbaycanê, şer her diçe li herêmê zêdetir dibe û wiha got: "Tirkiye ji bo berdewamkirina qirkirina ermenan vegeriya başûrê Qefqasyayê. Hikûmeta Azerbeycanê di van 15 salên dawî de zimanê şer bi kar tîne lê sedema biryardayîna destpêkirina vî şerî, piştgiriya dewleta tirk e."

Şêwirmendê Têkiliyên Derve yê Serokê Dewleta Qerebaxa Çiyayî Davîd Babayan jî destnîşan kir ku Tirkiye şer gur dike û wiha got: "Di destê me de delîl û belgeyên ku Tirkiye komên çekdar ji Sûriyeyê anîne hene."

**Mase vala ne**

Herî dawiyê jî der barê şerê li Qerebaxê de Nûnerê Bilind ê Polîtîkayên Derve yê Yekitiya Ewropayê (YE) Josep Borell bal kişand ser fikarên navneteweyî ya li ser tevlîbûna Tirkiye û Rûsyayê ya li şerê Qerebaxa Jorîn û got divê mudaxeleyên derve bên astengkirin.

Nûnerê YE'yê Josep Borell diyar kir ku ji bo agirbest û diyalogê li ser asta alî û hêzên herêmî hevdîtin hatine zêdekirin û wiha got: "Lê niha rewş ne wiha ye. Masa 30 sal in vala ye."

**Civaka ermen kom bû**

Hewceyî gotinê ye ku civaka ermen jî li Brûkselê çalakî kir û bang li Yekitiya Ewropayê kirin ku bikevin nav liv û tevgerê. Di çalakiya ku nêzî 2 hezar kes tev li bûn de, nerazîbûn nîşanî pasîfbûna Ewropayê hat nîşandan.






# Jinê mohra xwe li Nobela 2020'an da!

Xelata Nobelê ya ku her sal di gelek beşên zanistê (Kîmya, fîzîk) û beşa wêje û aştiyê de tê dayîn, îsal jî di gelek beşan de xelat hatin dayîn. Di gelek beşên wekî fîzîk, kîmya û wêjeyê de xelatgirtina jinan derkete pêş.



Xelata Fîzîkê ya Nobela 2020'an Andrea Ghez û Reînhard Genzel bi xebatên xwe yên kifşkirina çalên reş ê fezayê yên ku di navenda galaksiyê de ne, girtin.



Xelata wêjeyê ji bo helbestvana amerîkî Loûîse Glûckê hatiye dayîn.

Xelata Kîmyayê ya 2020'an jina mîkrobiyolog Emmanûelle Charpentîer a fransî û jina bîyokîmyager Jennîfer A. Doûdna girtin.


Emmanuelle Charpentîer û Jennîfer Doûdna bi xebatên xwe yên li ser mijara teknolojiya şekildayîna genê kirine de xelata Nobelê girtin. Amûra bi navê Crîspr-Cas9 a ku wekî 'meqesên genetîk' tên binavkirin, xwedî peywireke ku di hucreyên dijîn ên wek DNA'yê de guherînên hesas û berbiçav dike ye. Ev amûra ku her du jinan amadekirî de hem wê di lêkolînên bingehîn ên zanistê de hem jî di tedawiya nexweşiyên genetîk de dê were bikaranîn.

Wek tê zanîn, di dîroka beşa kîmyayê ya xelata Nobelê de ev cara yekem e ku du jin xelatê digirin. *STOCKHOLM*

# Nivîskarî û xwekuştin

Occo Mahabad


Di dîrokê de gelek kes û nivîskar xwe kuştine. Sedemên her xwekuştinê cuda ne. Di vê çalakî û biryara kesane de, mirov di tûrikê jiyana xwe de gelek raz û hestên tevlihev û nefambar vedişêrin. Em nikarin mijara xwekuştinê bi pêşdarazên beredayî mehkûm bikin. Divê baş bê fêmkirin ku nakokî û aloziyên heyî yên jiyanê, xwe bi siya mirinê ve û nîşanî civatê didin. Loma pirsa "Gelo çima xwe kuşt?" piştî mirinê giringiyê nade wate û sedemê. Hûn rast bibînin an jî nebinin, her xwekuştin ji sedî sed mijareke şexsî ye ku li gorî mantalîte û hebûna xwe sedemên rewa û mafdar dihewîne. Mirin û xwekuştin jin, mêr, zarok, netewe nas nakin.



Ramyar û filozofên serdema pêşîn û nûjen di vê diyarde û bûyera girîng de, ji hev cihê fikirîne û tevgeriyane.

Sokrat canê mirovan milk û sermiyana Xwedayan dibîne lewma ne alîgirê xwekuştinê ye lê dibêje ger mirov mecbûr bimîne xwekuştin ferz e.

Platon jî wekî Sokrat, întixarê rê û rêbazeke rast nabîne, taswîp nake ji xêncî sedemên mecbûrî.



Arîsto bi temamî li dijî xwekuştinê derdikeve. Întixarê karê hemwelatiyên bêkêr û xerab dibîne û rave dike. Li gorî Arîsto jiyan diyariyeke mezin e ku ji me re hatiye dayîn, divê qedr û qîmeta wê bê zanîn. Întixarê wek emelê ehmeqan şîrove dike. Arîsto arîstokratekî alîgirê hêzdaran e. Bi dîtina wî, mirina xelkê feqîr û reben girîng nîn e.

Epîkuros ger mirov bextreş û bêsiûd be dikare bi mafdarî xwe bikuje loma întixarê çalakiyeke rewa dibîne. Li gorî wî her mirov azad e ku xwe bikuje. Epikuros girîngiyê dide azadiya fikr û ramanên mirovan.

Cîcero ji ber sedemên olî û civakî li dijî xwekuştinê disekine.

Platonparêzên Nû yên wekî **Pythagoras, Plotînos û Porphyrîos** jî li dijî xwekuştinê derdikevin.

Seneca heke mirov zehf kal be û zewqa jiyanê nemabê xwekuştinê rêyeke mafdar teswîr dike.



Albert Camus bi hêrs dipirse: "Gelo jiyan tiştekî ewqas watedar e ku mirov bijî? Wate nemîne çîrok û serpêhatiya mirinê dest pê dike." Lewma di hişê Camus de xwekuştin mijareke pêwîst û watedar e.

Nîetzsche xwekuştinê erênî dibîne û dibêje: "Mirov heyîneke xurt nîn e, jiyan her roj lawaziyê bi bêhêvîtiyê ve derdixe pêşberî me. Ji ber vê carinan çalakiya herî mezin, esîl û şanaz xwekuştin e." Întixarê biryara kesên azad qebûl dike.

Schopenhauer jiyanê tiştekî erjeng dibîne û xwekuştinê bi dildarî dipejirîne. Bi fikra wî ev civat bi dizî, kuştin, şêlandin û bi hezaran xerabiyan cihekî kambax, rezîl û kepaze ye lewre întixarê wek rêya xelasbûnê dipejirîne.

Civaknasên serdema nûjen jî li ser întixarê ji hev cudatir fikirîne û sekinîne.

Emîl Durkheîm xwekuştinê rastiyeke civakî şîrove dike. Li gorî wî kesên xwe dikujin êdî bi civatê re li hev nayên bi zanebûn qestî canê xwe dikin. Durkheîm di întixarê de siya tenêtî, bêhêvîtî û belengaziyê digere.

Kant xwekuştinê naperijîne wekî tiştekî şermdêr û kerixîner dibîne.

Javata û Melvin Seeman di bingeha xwekuştinê de biyanîbûna mirov û civatê dibînin. Li gorî wan mirovên modern, belengaz û tenê ne rizgarbûnê di xwekuştinê de digerin.

Li ser întixarê gelek teoriyên psîkolojîk jî hene dixwazim fikrên çend psîkologan bînim ziman.

Li gorî Sîgmund Freud ji bo mirov tişta herî girîng diyardeya zayendîtiyê ye. Freud întixarê wek sadîzmeke ruhî pênase dike. Li gorî wî mirovên ku rihê wan birîndar û nexweş in dikarin xwe bikujin.

Di teoriya Erîch From de ajoyên civakî girîng in, ne tehnên kesane û zayendî. Li gorî wî her mirov di hundirê civakê de dibe mirov. From xwekuştinê pirsgirêkeke civatî qebûl dike û wisa dinirxîne.

Karl Menninger întixarê di navbera jiyan û mirinê de wekî şerekî dijwar û jêneger dibîne. Li gorî fikra wî kîjan xurt be ew qezenc dike.


Ol û baweriyên modern jî xwekuştinê li gorî xwe rave kirine.

**Ola Îslamê** xwekuştinê guneheke mezin dibîne, bi teqez qedexe dike girîngiyê dide jiyana mirovan. Lewma rêjeya întixaran li gorî lêkolînên kirî di hundirê misilmanan de pir hindik in.

Piştî ferman û nêrînên alim û mirovê dînî yên **Augustin, ola xaçparêziyê** întixarê erênî nake û nasepîne. Di serdema kevn a klasîk de rewş hinekî cudatir e, carinan xaçperestên bawermend ji bo ku ji zordestiyê xwe xelas bikin mecbûr dimînin bi komî an jî şexsî întixar dikin. Di roja me de otorîteyên xiristiyanî ji xeynî **mezheba protestanî** xwekuştinê gunehekî erjeng dibînin û napejirînin.

Ola cihûtiyê xwekuştinê wekî olên din ên sereke gunehekî li hemberî xwedê qebûl dike. Lewma li dijî xwekiştinê disekine. Cihûtî jiyanê pîroz dibîne.

Olên wek **hînduîzm, budîzm û caynîzim** li hemberî întixarê hikmên dijwar negotine û neanîne ziman. Hema hema em dikarin bibêjin ku rê dane xwekuştinê û teşwîq kirine, bi kirinên xwe.



Xwekuştin bi sedan reng, sedem û armancan dikarin derkevin pêşberî me, lê divê em fêm bikin ku xwekuştin rastiyeke civakî ye mixabin her tim dê rastî me were. Dawiya dawî nivîskar jî mirovekî/ê ye dikene, digirî, bedbext an jî bextewar dibe. Hêza nivîskar qelema wî/ê ye. Bi qelem û fikrên xwe pêşengiya civatê dike. Civat fêm neke jî ew mecbûr e rola xwe ya dîrokî bilîze û bibe neynik û wijdana civatê. Di dinyayê de gelek nivîskarên jêhatî bi sedemên cihê xwe kuştine. Ez ê ji xwendevanan re behsa jiyana çend nivîskarên kurd û yên biyanî bikim ku xwe kuştine.

Dema ku behsa xwekuştinê derbas bibe nivîskar û helbestvanê kurd Şikoyê Hesen tê bîra min.

Şikoyê Hesen di sala 1928'an de li gundê Camuşvana biçûk ku girêdayî navçeya Axbarana Ermenistanê ye tê dinyayê. Malbata Şiko piştî şerê cîhana yekemin, ji ber qetliyama dewletê xwe xelas bike mecbûr dimîne ji Dîgora Qersê koçî Ermenistanê dike. Şiko hê pênc salî ye bavê wî Hesenê Mido dimire; apê wî Sofî lê xwedîtiyê dike.



Şiko piştî xwendina xwe ya seretayî, navîn û ya dawî di sala 1948'an de diçe zanîngeha Erîvanê beşa ziman û zanistiyê dixwîne. Bi xelaskirina zanîngehê re di navbera salên 1954 û 1957'an de mamostetiya zimanê ermenî dike.

Şiko di beşa kurdî ya radyoya Erîvanê de dest bi edîtoriyê dike û di navbera salên 1959 û 1961'î de jî karê şêwirmendî û wergêriyê dike. Demekê edîtoriya radyoya Rewanê dimeşîne. Di sala 1961'an de bi sedema perwerdeyê diçe Lenîngradê û ser zimannasiyê doktoraya xwe dike. Di sala 1965'an de di Enstîtuya Gelên Asya û Afrîkayê de beşa Kurdolojiyê temam dike.

Helbestên Şiko cara pêşî di rojnameya Zanîngehê de û dûre jî di rojnameya Rêya Teze de tên weşandin û car caran jî li radyoya Kurdî tên xwendin. Şiko dibîne ku dewleta Sovyetê pişta kurdan digire, her derfetê radixîne pêş wan ziman, çand, huner û jiyana kurdan mezin û bilindtir dike. Bi vê mebestê her tim dibe alîgirê dewleta Sovyetê.

Şairê dildar, qelemhêz û hestiyar Şikoyê Hesen di sala 1976'an de xwe dikuje lê hê jî sedema xwekuştina wî ya rasteqîn nayê zanîn. Gora wî li paytexta Gurcistanê ya bajarê Tiflîsê ye.




Heta mirina Şiko sê heb pirtûkên wî çap dibin. Di sala 1961'î de pirtûka Qalçîçek, di sala 1966'an de pirtûka Tembûra Kurda, herî dawî di sala 1970'yî de Meremê Dilê Kurd.

Piştî mirina Şikoyê Hesen bi navê "Perwaza Welat" û "Payîz û Ba" du heb pirtûkên wî çap dibin.

Ez çiqas qala wî şairê zimanhez, helbesthez, fîdekar û jêhatî bikim dilê min diêşe. Şiko ji nivîskarekî wêdetir însanek e. Divê xwendevan bizanibin û têbigihîjin ku her xwekuştin çalakiyeke kesane ye û li gorî xwe sedemên rast û mafdar dihewîne.

Divê neyê zenkirin ku xwekuştin qelsî an jî bêhêzî ye. Ji ber ku her xwekuştin bi zanebûnî tê kirin û xwestin. Ka ji xwe bipirsin "Gelo çend kes dikarin xwe bikujin û konê xwe bar bike ji vê dinyaya fanî".



Nivîskarê duyemîn yê kurd ku xwe kuştiye dixwazim bi we bidim nasandin, ew helbestvanê zîrek Mihemed Omer Osman e.

Mihemed Omer Osman di sala 1957'an de li taxa Dêrgezên bi ser bajarê Silêmaniye ye tê dinyayê. Dema pola sêşemê dixwend ji ber şerê di navbera Iraq û Îranê xwendina xwe nivî dihêle. Di sala 1975'an de dest bi karê nivîsandin û rojnamegeriyê dike. Carinan ji ber sedemên darayî karkeriyê dike.

Helbestên wî ji aliyê ciwanên kurd ve pir tê hezkirin. Ji ber helbesta wî ya Generalê Payîzê ku di dîwana wî ya Li Xurbetê de cih digirt navê wî wek Generalê Payîzê hat binavkirin.

Di sala 1991'ê de li Şeqlawayê di Kongreya Yekitiya Nivîskarên Kurd de dibe endamê Yekitiya Nivîskarên Kurd.

Berhemên wî heta niha di gelek rojname, kovar û malperan de hatine weşandin. Pirtûka wî ya Li Xurbetê di sala 2013'an de li Bakur ji aliyê weşanxaneya Avestayê ve tê çapkirin.

Ev şairê dilgeş, di sala 2019'an de mixabin di mala xwe de xwe darde dike. Mebesta xwekuştina wî ji raya giştî ve tucarî nehat zanîn.

Piştî helbestvanên kurdan divê em hinek jî bala xwe bidin nivîskarên cîhanê. Gelek nivîskarên cîhanê yên întîxar kirine hene wek mînak; Virginia Woolf, Mayakovskî, Walter Benjamin, Sylvia Plath, Cesare Pavese, Stefan Zweig, Jerzy Kosinski û gelek navên din.

Ez ê ji we re bi tenê qala du nivîskarên cîhanê bikim ku bandoreke mezin li ser xwendevanên cîhanê hiştine.

Parêzvanê bizava futurizmê nivîskar û şanoger Vladimir Mayakovski di sala 1893'yan de li Gurcistanê ji dayik dibe. Bi saya fikr û ramanên xwîşka xwe Bolşevîkan nas dike di 15 saliya xwe de dibe endamê Partiya Komunîst ya Bolşevîkan. Ji ber çalakî û nêrînên xwe yên sosyalistî pirî caran tê girtin û dikeve hepsê.

Piştî damezrandina dewleta Sovyetê ji bo pêşxistin û fêmkirina bizava futurizmê hewl dide, dixebite, gelek helbest û tekstên şanoyê dinivîse.

Dostê wî yê jê zehf hez dikir Sergey Yesenin li Lenîngradê întîxar dike. Ev bûyera întîxarî dilê wî pir diêşîne û tesîreke mezin lê dike.

**Mayakovski** gelek caran ji ber fikrên xwe yên rexneyî tê şermezarkirin lewma ji aliyê nivîskarên din zêde nehatiye hezkirin û qebûlkirin.

Rihê Mayakovski wekî zarekî biçûk û delodîn bû. Tu carî ji aliyê derdora xwe ve nehat fêmkirin. Em dikarin bêjin ku ew mirovekî tenê bû.

Vladimir Msyakovski di sala 1930'yî de bi çeka xwe ya emegdar xwe dikuje.

Nivîskara duyemîn a biyanî ku jiyana wê zêde zêde bandorker û balkêş e, dixwazim hinek behs bikim ku bila xwendevanên me hinekî binasin.

Helbestvan û nivîskara amerîkî ya zarxweş **Sylvia Plath** di sala 1832'yan de li Massachusettsê ji diya xwe dibe.

Plath helbesta xwe ya pêşî di heşt saliya xwe de dinivîse. Di sala 1940'î de bavê wê dimire. Ev mirin jiyana Plathê tevlihev û serobino dike. Piştî mirina bavê wê tê dîtin ku Plath nexweşê psîkiyatrîk ya manîk depresif e.

Di sala 1950'yî de li Smith Colegeê dixwaze xwe bikuje lê bi ser nakeve wek birîndar xelas dibe. Demeke kurt ji ber vê bûyera xêrnexwez li timarxaneyê dimîne.

Di sala 1955'an de koleja Smith diqedîne. Piştî kolejê zanîngeha Cambridgeê dixwîne û xebatên xwe yên nivîskî li wir didomîne. Gelek helbestên wê di rojnameya Varsity a zanîngehê de tên weşandin.



Di sala 1956'an de bi helbestvanê îngilîzî Ted Hughes re dizewice jiyana xwe li Londonê didomîne, lê ji ber nexweşiya wê ya psîkiyatrîk ya manîk depresif zewaca wê zêde dewam nake mêrê xwe berdide jê vediqete bi zarên xwe re bar dike cihekî din maleke kevn û erzan kirê dike.

Di sala 1963'an de ji ber jiyana xwe ya feqîr, belengaz û dijwar zarokên xwe di odeyekê de kilît dike berê xwe dide mitbaxê serê xwe dixe hundirê firinê bi gaza firinê xwe dikuje.

Hûn jî dibînin ku xwekuştin rastiya jiyana cîhana me ye. Helbet gelek sedemên xwekuştinê hene: Sedemên psîkiyatrîk, felsefîk, olî, civakî, îdyolojîk, ekonomîk û yên şexsî.

Sedem her çi bibe jî ev tercîha kesan e. Hûn bûyer û rastiya xwekuştinê qebûl bikin an jî nekin ew ê her tim her roj şopa xwe bi siya mirinê ve derxe pêşberî we.

Firçeya Şikte

# Terapî de xebitnayîşê hunerî

Gulçîn Adar

Însan, riyê erdî ganeyêke zaf zelal û qasê zelalbîyayîşê xo zî hende têmîyan o. Bi bîyayîşî însanî dir problemî zî vejîyayê meydan. Hîn problemî tebiî bîyê û hîn zî bi destê însanan ameyê meydan. Sey; afat, şer, vindikerdiş (merg) şîdet ûsn hîn însanan de bîyê sebebê travma û coka seba weşîye psîkolojî û ruhî, xeylêk cigêrayîşî virazîyayê û hetê zanistan ra tewir tewir rayîrî ameyî ceribnayîşî. Nê ceribnayîşan ra yew zî; terapîyê hunerî yo. No metod hîna zaf seba ke hîsê ke nimteyê, fikrê ke nêeşkenê bêrê serê ziwanî vejîyayo werte. Xora seke yeno zanayene huner, rayîrêk xo îfadekerdiş û rehetkerdîşî yo û xebitnayîşê hunerî seba weşkerdişê ruhî metodêk baş o.

Terapîyê hunerî de zî amaco ewil; seba averşîyayîş û weşkerdişê ruh û hîsî de hêzê hunerî xebitnayîş o. Seba ke têmîyanbîyayîşê zerrî û probleman rê bibo rayîrêk çareserî, stres bikero binê qontrolî, şaxanê hunerî xebitneno û no metod, hîna zaf bi hawayêk sîstematîk bi ca ano. Çîyê ke binhişmendîyê însanî de mendê, hîsê ke dejnenê bi hunerê sey; muzîk, resim, drama, nusnayîş û dans vejeno teber. Bi vejîyayîşê fikr û hîsan seba terapîstan îmkan dano ke tewr zaf sebebê probleman bizanê. Xora huner, verê ra heta nika xeylê mîyanê dîsîplînan de ca girewto û wareyê psîkiyatrî de zî ameyo bi caardene û prosesê terapî de tewir tewir materyalî ameyê xebitnayene. Seke yeno zanayene; depresyon, travma û stresî ra qismêk organê hîsî bêfonksîyon manenê, semedê aktîfkerdişê înan zî nê caardişî feyde danê. Ancax nê caardişan psikolog û psîkiyatrîstî eşkenê bikerê û kesê ke perwerdeyê hunerî dîyê zî binê muşahedeyê psîkiyatrîst û psîkologan de karê înan rê eşkenê bibê hetkar. Çunke eke merdim na babete de pispor nêbo beno ke xesarêk pîl serê nêweşî/e de verdo. Nê caardişî mîyanê xo de rîsk zî hewênenê. Beno ke travma tewr zaf kûr bikerê û reaksîyonê ke merdim nêpawo vejê werte. Eke merdim pispor nêbo vera rewşêk winasî de bêçare maneno û nêeşkeno bibo hetkar. Seba nê profesyonelî gerek keno.

Şaxê hunerê ke terapî de yenê xebitnayene ra merdim eşkeno bi dîyayîşê hunerî dir destpê bikero. Resim, hunerê ebrû, heykel, seramîk, fotograf ûsn aktîvîteyan ra feyde yeno girewtene. Terapîstî ganî caardişan de mudaxele nêkerê. Qetî sînor nêdê ro û teknîk ser nêvinderê. Semedo ke amanc eserêk weş ney, eserêk hunerî ney, hîsê ke nêvejîyenê teber yeno viraştene. Endîşeyê weşviraştişî ra dûr îmgeyê xoser rê ca dîyeno ci. Her materyalê rengî serbest yeno verdayene. Babete zî serbest yena veradayene.

**Têkilîyê kay û qiseykerdişî**

Tîyatro (drama) terapîyê hunerî de cayêk girîng gêno. Gama ke no metod yeno xebitnayene hîna zaf kayê ke bi rolê a/o kesî rê munasibê û ci ra aciz nêbeno/a yan zî endîşeyê ci hîna zêde nêkero hetê pispori/e ra yeno/a weçînayîne. Amanc reyna zî tebervejîyayîşê hîsan o. Têkilîyê kay û qiseykerdiş ser o şexs/e eşkeno/a xo bivîno/a.

**Metodê dansî**

Dans; hereketê ke yenê kerdene seba xodîyayîşî, kifşkerdişê hîsan de rayîrêk terapî yo. Bi hereket û dansî ferqkerdişê bedenî de kontrolkerdiş hîna beno asan. No metod zî seba pêrûne merdim nêeşkeno vajo baş yeno. Munasibîyê ci goreyê şexsan vuryeno û ganî no zî hetê terapîstî/e ra bêro muşahedekerdene.

**Metodê nuştişî**

Nuştiş; bi rayîrê hîkaye hîsanê merdimî rê beno hetkar. Bi xeyelan awankerdişê karakteran, yan zî awankerdişê hedîseyêk ser o xo kifşkerdişî rê metodêk terapîyê hunerî yo. Hîn kesî hetê nuştiş de hîna bihunerê û eşkenê xo wina hem baş bîyarê ziwan û eşkenê binuştiş xo baş hîs bikerê.

**Metodê muzîkî**

Muzîk; metodêk zaf verê ameyo xebitnayene. Seba weşîya ruhî, însanê verênan hacetê ke viraştê xebitnayê û pêwa nê hîsanê xo ardê ziwan. Terapîstê hunerî zî nê metodî xebitnenê. Bi xebitnayîşê hacetê muzîkî dir hem rîtîm û hem veng ser o caardiş kenê. Reyna sînorkerdiş çin o û goreyê rewşe kesî/e vuryeno.

**Sokrates:** Xidayê ruhî muzîk o

Seke aseno terapîstê hunerî seba başkerdişê hiş û ruhî, teknîkê hunerî bi hawayêk sîstematîk xebitnenê. Huner, cigêrayîşê vînayîşê weşîye yo û weşîkî zî goreyê kesan vuryeno. Coka semedê kam ci şaxê metodî de bêro xebitnayîşî goreyê taybetîyê ci, lazimîyê ci zî yeno qontrolkerdene. Nê direktîfî reyan, rehetîyê kûrî, reyan dans, reyan viraştişê resimî û vatişê deyîran ra yenê meydan. Her çiqas hetê hîn hunermend û hunerhezan ra vatişê "huner, baş keno" nêro tesdîqkerdene û bêro rexnekerdene zî merdim nêeşkeno hetê başîye ruhî ser hêzê hunerî înkar bikero. Bi manakerdişê û îfadekerdişê fikr û hîsan de rayîro tewr baş huner o. No metod gama ke baş bêro xebitnayene feydeyêk zaf rind yeno girewtene. Seke fîlozof Sokratesî zî vato, "xidayê ruhî muzîk o" ma zî vanê huner xidayê ruhî yo, bihuner ruhê xo mird bikerê.



# Kovara Kultur û Hunerî ca daye 33 şehîdanê Pirsûsî

20ê Temmuza 2015î de bi seyan kesî seba şîyayîşê Kobanê û paştîdayîşê domananê Kobanê bajaranê cîyacîyan yê Tirkîya ra arê bîbî û wexto ke Merkezê Kulturî yê Amara yê Pirsûsî de eşkerayî dayêne raştê hêrişêko bombeyin yê DAIŞî ameyî. Netîceyê teqayîşê bombeyin de 33 ciwanê Federasyonê Komeleyê Ciwananê Sosyalîstan (SGDF) cuya xo vindî kerdî û bi seyan kesî zî birîndar bibî. Bi serkêşîya SGDFyî 25 rêxistinê ciwanan seba serrgêra 5. yê Qirkerdişê Pirsûsî bi sernameyê 'Seba Pirsûsî edalet, seba herkesî edalet' kampanyayêka hunerî dabî dest pêkerdene û Weqfê Cigêrayîşê Huner Kultur Estetîk Perwerde û Zanistî (BEKSAV) kampanya bi siloganê 'Seba Pirsûsî Berardene' girewt milê xo sero. Kovara Kultur û Hunerî zî na hûmare de ca daye şehîdanê Suruçî. Hemsereka BEKSAVî Canan Kaplane qala Kovara Kultur û Hunerî ke na hûmare de ca daye 33 raywananê xeyalî ke hêrişê DAIŞî de cuya xo vindî kerdîbî, kerde.

Gama ewil ê kampanyaya semedê 33 raywananê xeyalî de, deyîrê ke şehîdê Pirsûsî ci ra heskerdêne hetê hunermendanê ke ê ci ra heskerdêne ra ameyî vatene. Deyîrê ke ameyî vatene serê kanalê Youtube ê BEKSAVî de ganî ameyî weşanayene. Gorselê ke ameyî yew hewte serê kanale de weşanîyayî. Tewr peynî zî BEKSAV hûmara taybet ê Kovara Kultur û Hunerî vet. Kovare de xeylê şîîr, hîkaye û resîmî estî. Sewbîna nuşteyê ke wextê qetlîyamî de hetê şaîr, nuştox û hunermendan ra ameyî nuştene zî kovare de ca girewtî.

**Hûmara taybet ê kovare**

Kaplane dîyar kerde ke resîm, şîîr, cerebnayîşî hîkaye û karîkaturê ke ameyî berardene semedê hûmara taybet ê Kovara Kultur û Hunerî arê dayî û wina va: "Kovare hirê beşan ra pê yena. Ma beşa yewine de cigêrayîşê ke Tirkîya, Ewropa, Kurdîstan û Rojawanî ra ameyî kontrol kerd. Beşa diyîne de ê tepîşteyan. Beşa hirêne de zî nuşteyê ke qetlîyam dima ameyî nuştene û kovara Ozgur Gençî de ameyî weşanayene estî. Nê nuşteyî seba ke tesîrê yewine îfade kenî coka ma semed muhîm ê. Ma ca da nuşteyanê sey Îrfan Aktan, Sîbel Ozbudun, Ragip Varolî. Ma waşt ke derheqê no hîs kam ca de dest pêkerd û kam ca de qedîya de verîyêk bibo."



**Zîndanan ra eleqe zêde yo**

Kaplane dewamê qiseykerdişê xo de daye zanayene ke kovare rê eleqeyêk gird esto û domnaye: "Tewrê zêde zîndan û keyeyan ra eleqeyêk gird esto. Wendoxê ma eşkenê serê înternet û kitabxaneyan ra biresê ma. Çapa yewine ê na hûmare tay mendo biqedîyo, çimkî tede 33 raywananê xeyalî û cuya înan esto. Mînak hîkayeya embazêk ke semedê embazê xo yê ke cuya xo vindî kerd û ci ra xeridnayebî, esto. Kesêk zî semedê embazê xo ê ke demêk ci reyde qisey nêkerd û bado ke qisey kerd embazê ci cuya xo vindî kerd, nuşte nuşt. Nuşteyê ciwan û cinîyan ke têkoşînê înan meşnenî estî."

**Wezîfeyê ma wayîrvejîyayîşo**

Kaplane qiseykerdişê xo yê peyênan de bale ante têkoşînê edaletî ê semedê 33 raywananê xeyalî ser o û wina qedênaye: "Tena têkoşînê 33 raywananê xeyalî nîmcet nêmend, xeyalê înan zî nîmcet mend. Temamkerdişê xeyalê înan semedê ma wezîfek o. Pirsûs, hîkayeya ciwanê ke semedê şahidîya şorişî Tirkîya ra şîyî Kurdîstan, semedê awankerdişê bajarêk ke veşayo û rijîyayo, semedê awankerdişê pirdê ciwananê şorişgeran û semedê bîyayîşê parçeyêk ewja, ya. Cayo ke faşîzm xo hende berz bîyo parçe parçe keno de wezîfeyê ma wayîrvejîyayîşo." *STENBOL*




# Serê bîrên petrolê sax be

Yê îtalyan gotiye; keçên me gelekî bi nav û deng in xweşik û nazdar in...

Yê alman gotiye; erebeyên me gelekî baş û navdar in...


Yê înglîz gotiye bîra me gelekî navdar e...

Yê fransî gotiye; şeraba me û avahîsaziya me gelekî navdar e...


Yê îranî gotiye; xalî û merşên me yên neqişandî gelekî navdar in... Dawî dor hatiye ser erebekî kendavê û wî wiha bersiva tevan daye:

Ez tu karekî nakim lê destgirtiya min îtaliyan, erebeya min malê alman e; ez bîraya îngilîzan vedixwim; di avahiya bi avakirina avahîsazên fransiyan de dijîm û mala xwe bi xaliyên îranî radixim. Serê bîrên me yên petrolê sax be.

Ez jî dizanim heke rojekê ew bîrên petrolê biçikin, wê çiyê we navdar bibe!



## XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Bajarekî bakurê Kurdistanê 3. Roja em tê de ne 5. Bawerî
6. Hunermendekî navdar ê bi nijada xwe ermen, Garabêtê ….
7. Paytexta Sûriyeyê 9. Xwediyê kar 12. Bajarekî bakurê welat
14. Cejin 15. Paytexta Ermenistanê 17. Noteyeke muzîkê
18. Bersiva neyênî
22. Bi dizî guhdana axaftina hinekan

JI JOR BER BI JÊR

1. Banga ji ber qewimîneke xirab, waweylê 2. Seyda masî û heywanan 3. Rojeke hefteyê 4. Erêkirina tiştekî, ji îngilîzî ketiye gelek zimanan 5. Hişyarkirin 7. Çekdarê parastina welatê xwe dike
8. Demeke salê ji 30 rojî pêk tê
10. Arvan 11. Cihê xwarina sewalan dixinê 13. Dawiya hemû duayan tê gotin 14. Giraveke Tirkiyeyê ku wekî zindana kesî tê bikaranîn
16. Dîtina tiştekî nû, afrende
19. Ji nişkan ve 20. Qul
21. Sewaleke kesî 23. Cihê genim lê tê hêran

*Bersiva hefteya borî*




## Şûjin

Dildarê Amedê

## Îca 'vegan' ji me kêm bû!

Beriya demekê min nû nas kir ku vejeteryan çi ye û çima vî navî li xwe dikin. Êdî ez hîn bûm ku ji kesên goşt naxwin re wiha dibêjin. Me hê ew mesele baş ji hev dernexist, Îca vê carê ez li yekî din rast hatim.

Got ez hêkan naxwim. Min got heyra tiştê ez dizanim kesên vejeteryan goşt naxwin, ne hêkan. Camêr got ma kê ji te re gotiye ez vejeteryen im. Min got naxwe tu nexweş î, çi bela te ye tu hêkan naxwî? Camêr got heyra ez vegan im. Min got la hewla wela quwete îla bîlah!

Îca vegan çi ye bira? Got, ê me em ne goşt ne jî tu berhemên ku ji hewanan tên bidestxistin naxwin; em ne goşt, ne mast ne hêk û ne jî tu berhemên din.

Îca jixwe berê çend hevalên me yên nîvvejeteriyan hebûn û ji ber îmkanên kêm, çavê me bi goşt nediket; çavê vî hevalê me yê nû hatiye saziyê lê ye ku em mast û hêkan jî nema bixwin.

Bi rastî jî min nû ev meseleya vegan bihîst û ez tiştekî der barê wê de nizanim lê tiştê ku baş dizanim, heke wiha ev vegan û megan berdewam bike wê îmana serê me were gadan.

Îca wek meseleya kirîvê me Mihemed li min hat; ez di nav vegan û vejeteryanan de mame, nema dizanim çi çi ye.

Li gundê me, kirîvê me Mihemedê Hecî zewicî. Mele hat ku mehra wî bibire. Mele jê pirsî: "Ma em mehra te li ser îmamê şafiî yan jî henefî bibirin." Mihemed got: "Bi xwedê ez henefî û şafiî nizanim çi ne lê tiştê ku ez dizanim em omerî ne û ji gundê Cibilgirawê ne. Îca tu dizanî seyda, dixwazî li ser henefî dixwazî li ser şafiî bibire."

Îca bi xwedê wiha li serê min jî hatiye. Tiştê ez dizanim bê goşt û hêk ez nikarim tamekê ji şîv û taştêya xwe bikim. Heke ev her du tune bin, ez nema ne taştê ne jî şîvê dixwim!

Ji aliyekî din ve, carnan jî di dilê xwe de dibêjim de baş e heyra, bila vegan û vejeteryen zêde bibin belkî hinekî mîratê goşt erzan bibe û em dikaribin carê ji xwe re bikirin.

Heke hejmara wan zêde bibe û goşt erzan bibe, belkî em dikaribin wekî berê ji xwe re qeliyê jî çêbikin û vê helbesta xwe diyarî wan hevalên hêja dikim.

*Hêviya me ma rehîm û rehman*
*Her wiha hevalên vegan*
*Ku bihêlin goşt bibe erzan*
*Bi taybetî ji bo kurdan*
*Ew bûye wekî zêran*
*Ne tê kirîn ne tê firotan*
*Lê bi tekoşîna van hevalan*
*Dê ew bibe Hekîmê Loqman*
*Ji bo feqîr û belengazan*
*Her bijî hevalê vegan*
*Ji bo vê berxwedana wan*

# Bîra Miriyan li Maksîm Gorkiyê hat pêşandan

**Felat Niştiman**

**Şanoya bi navê Bîra Miriyan a ji aliyê nivîskar Yildiz Çakar ve bi kurdî hatiye nivîsîn, bi zimanê erebî û bi binnivîsa almanî û îngilîzî li Şanoya Maksîm Gorkî ya Almanyayê bi awayê dîjîtal hat pêşandan**

Li welatên cihê, bi piranî ji ber sedemên siyasî, gelek nivîskar, hunermend û ronakbîrên kurd dijîn û berhemên xwe li van deran dinivîsin. Nivîskar Yildiz Çakar jî yek ji wan nivîskaran e ku ev demek e li bajarê Berlîn ê Almanyayê dijî. Wê li vê derê navber nedaye nivîsînê û her nivîsiye. Çakar ji bo rojnameya me Xwebûnê behsa kar û barên xwe yên wêjeyê û bandora dûriya ji welêt a li xwe kir.

**Birînên xwe baştir dîtine**

Çakar destpêkê der barê dûriya xwe ya ji welêt de axivî û diyar kir ku bi derketina ji welêt re ew bêtir bi êşên xwe hesiyaye û wiha got: "Min dît ku bi salan e di heman çerxê de haya min jê çênebûye, ez çiqas birîndar bûme; bi dûrketina ji welêt re min birînên xwe baştir dîtin; çiqas ji malê dûr ketim min ewqas xwe li malê dît. Li welêt tiştên bi rojan di ber wan re derbas bûme û tu car bala min neketiye ser wan, niha baştir dibînim. Loma jî belkî carinan mirov ji nav agir derkeve û ji dûrî ve li xwe binêre, belkî baştir xwe bibîne. Vê gavê wiha difikirim û hîs dikim."

Nivîskar Çakar diyar kir ku sê sal berê li Berlînê festîvaleke helbestan a navnetewî hat lidarxastin û cara yekem helbestvanên kurd û alman di vê festîvalê de hatin ba hev. Di bernameyeke vê festîvalê de xebata atolyeya helbestan tê kirin û ji Kurdistan, Kafkasya û Ewropayê şeş helbestvanên kurd tev li vê atolyeyê dibin û Çakar jî yek ji wan e.

Çakar destnîşan kir ku ew bi du helbestên xwe, 'Zêmarên Rojê' û 'Ger ji destê te bihata min ê welatek bixwesta' tev li atolyeyên vê festîvalê dibe. Helbestên wê tên ecibandin û paşê ji kurdî bo îngilîzî û almanî tên wergerandin. Bi weşandina van helbestan re, Çakar tev li gelek bernameyên wejêyê dibe û piştre Şanoya Kraliyetê ya Shakespeare, Şanoya Maksîm Gorkî û Şanoya Schauspiel Stuttgartê ji bo werin pêşandan jê dixwazin ku helbestên xwe veguhezîne metnên şanoyê.



**Li Gorkiyê 'Bîra Miriyan'**

Piştî gelek xebatên atolyeyê, nivîskar Çakar lîstika şanoyê ya bi navê 'Bîra Miriyan' dinivîse û ev lîstik li Şanoya Maksîm Gorkî ya li bajarê Berlîn ê Almanyayê bi awayê dîjîtal hat pêşandan. Şano ji kurdî bo erebî, almanî û îngilîzî hatiye wergerandin. Zimanê şanoyê bi erebî ye û binivîs jî bi almanî û îngilîzî ne. Çakar diyar kir ku wê ev şano ji bo 'Dayikên Şemiyê' û dayikên 'Plaza De Mayo' yên Arjantînê nivîsiye. Derhênerê vê şanoyê Bashar Murkus e û lîstikvan jî Asmaa Azaîzeh, Salwa Nakkara û Bashîr Nahra ne.

Nivîskar Çakar der barê 'Bîra Miriyan' de hin agahî dan û diyar kir ku şano ji çar monologan pêk tê û di her monologê de dayikek li zarokên xwe yên hatine windikirin digere. Her yek ji van çîrokan li mekanekî cuda ye. Piştî monologan her çar dayik li ber bîra ku heta ber dev tijî hestiyên mirovan e, li erdê rûniştî ne û li bendê ne ku parçeyek hestî û kevirek ji zarokên wan bigihîjin wan.

**Xelat girt**

Di berdewama axaftina xwe de Çakar ragihand ku piştî 'Bîra Miriyan' hatiye pêşandan, gelek nivîskar û derhênerên ji deverên cihê yên dinyayê jê re name û peyam şandine û wiha domand: "Min fêm kir ku ger tiştekî mirov ê baş hebe, heft qat di bin erdê de be jî wê were dîtin. Ger xerab be, li ava zêr jî bixî wê dîsa jî bêfêde be. Min bi romana xwe ya bi navê 'Deriyê Winda-Hangar Funf' serî li Senat Berlînê da. Senatê, ji nav 178 nivîskarên ji her aliyê dinê, xelat dan me 11 nivîskaran. Ev xelat û karên min li Almanya, Îngilistan, Amerîkaya Latîn heta Afrîkayê axaftinên min ên li ser ziman, wêje û welat qonaxeke girîng in. Li Meksîkoyê li dibistana navteweyî ya şanoyê, axaftina min a li ser Kurdistanê bo spanyolî û îngilîzî hat wergerandin."

**Dewlet destekê dide nivîskaran**

Nivîskar Çakar têkildarî cihêtiya rewşa di navbera nivîskarên alman û kurd de jî nêrîna xwe vegot. Çakar diyar kir ku li Almanyayê qîmeta nivîskaran heye û nivîskarên alman tenê ji bo dikaribin karê xwe bikin, ji wan re her sal ji aliyê dewletê ve budçe tê veqetandin û wiha got: "Ji aliyê felsefe û wêjeya dinyayê ve bingeha wan pir xurt e. Loma jî bo pêşandana berhemên xwe zehmetiya wan li ber ya me, bi qasî serê derziyê ye. Li vir nivîskarek bi pirtûkên xwe debara xwe dike, lê li cem me hem nivîskar hem weşanger, bi berhemên xwe nikarin debara xwe bikin. Bi sedan weqfên piştgiriyê didin huner û wêjeyê hene. Ji ber koronayê dewleta alman ewil alikarî da nivîskar û hunermendên xwe. Ew jixwe razîne, lê em...?"

Di dawiya axaftina xwe de Çakar behsa xebatên xwe yên nû kir û wiha got: "Min romaneke nû nivîsand û sala pêşiya me wê were weşandin. Niha şanoyeke din jî dinivîsim. Ger astengiyek dernekeve wê meha mijdarê bi awayê dîjîtal bê weşandin. Her wiha amadekariya pirtûkeke bi navê 'Zêmarên Rojê' dikim."

Tevî 'Bîra Miriyan' çar şanoyên din ên nivîskarên cihê li ser malpera Out of Sightê (https://lcb.de/programm/out-of-sight-filmische-lesungen/) dikare bên temaşekirin.

# Çîrokên muzîka cazzê bi kurdî nîqaş dikin



**Bêrîvan Kayi**

Di bin saziya Komeleya Mezopotamyayê ya Muzîka Cazzê û Çanda Reqsê de bi alîkariya 'Qad Ji Bo Çandê ' (Girêdayî Enstîtutiya Geotheyê ye) dê komek ciwanên ku bi dans û muzîka cazzê ve eleqedar in, bi navê Dem û Cazzê dest bi bernameyeke radyoyê bikin. Projeya dê bi kurdî dest bi weşanê bike, niha bi awayê onlîne dest bi xebatên xwe yên atolyeyê kiriye. Bernameya muzîka cazzê dê di dawiya meha cotmehê de dest pê bike.


Projeya Dem û Cazzê ya li ser qenala 'Radyo Amed'ê dest bi weşanê bike, bi nevarokên dans û muzîkên cazzê ji aliyê 12 kesan ve hatiye amadekirin. Ev beşdar dê di serî de tev li atolyeya Dem û Cazzê bibin û pişt re jî dê nîqaşên sosyolojîk heta yên antropolojîk û hwd. li ser muzîkê werin kirin. Der barê mijarê de Koordînatorê Projeya Dem û Cazzê Haznî Demîr diyar kir ku li Amedê kesên radyoya xwe vekirin bila li kêleka dengbêjan dengê muzîka cazzê jî bikin.

Haznî Demîr (26) di projeya Cazz û Demê de koordînatorê projeyê ye. Demîr piştî ku di zanîngehê de beşa civaknasiyê xelas dike, dest bi dansên cazz û muzîkê dike. Li Amedê hem bi koordînatoriya projeyên ku ji aliyê Komeleya Mezopotamyayê ya Muzîka Cazz û Çanda Reqsê tên meşandin dike hem jî asîstanî û mamostetiya reqsa cazzê dike.

**Cazz û temayên civakî**

Demîr di axaftina xwe de qala naveroka projeyê kir û ev tişt anî ziman: "Ev proje ji aliyê 12 kesên ku di mijarên reqs û muzîka cazzê de pispor in tê amadekirin. Bingeha bernameyê jixwe li ser muzîka cazzê ye û bi temayên civakî em ê bernameyên xwe bi hev ve girê bidin. Mijarên mîna cazz û jin, cazz û nijadperestî, caz û sektora şahiyê, caz û hevbandoriya çandên cuda de amade bikin. Di nav demê de li gorî daxwaziyan dê ev mijar werin zêdekirin."

Haznî Demîr der barê projeya radyoyê de diyar kir ku bername dê tenê saetekê berdewam bike, nîvê vê bernameyê muzîkê be û nîvê din jî li ser van muzîkan nirxandinên kurdî bin. Di serî de beşdar bi çîrokeke cazzê (ya mîna dema jineke ku bi stranên xwe yên cazzê derketî ser dikê zehmetiyên çawa jiyaye, çi hîs kiriye û hwd.) dê dest bi bernameyê bikin. Bi temayên cuda dê ev bername berdewam bike.



**'Bila bi kurdî werin nîqaşkirin'**

Demîr bal kişand ser armanca projeya Dem û Cazzê û da zanîn ku bi vê projeyê dixwazin di radyoyên Amedê de dengê muzîkên ku xwedî dîrokeke balkêş in jî hebe û li kêleka dengê dengbêjan dengê muzîka cazzê jî bilind bibe û wiha pêde çû: "Bi vê projeyê me xwest ku gelek mijarên civakî bi rêya nîqaşên muzîkê jî werin ser ziman. Ji ber ku muzîka cazzê di esasê xwe de ji bingeheke civakî derketiye holê. Em dixwazin mijarên mîna cazzê jî bi kurdî werin nîqaşkirin."

**'Mijar cuda ne, çîrok yek in'**

Di dawiya axaftina xwe de Haznî Demîr anî ziman ku her çiqas cureyên muzîkan ji hev cuda bin jî çîrokên wan yek in û wiha got: "Em dixwazin di lîteraturê de dema hin kes ketin nav lêgerînan cureyên muzîka cazzê, nîqaşên li ser vê mûzîkê yên bi her zimanî hatine kirin, bi kurdî jî werin kirin. Ji ber ku em ê bernameya xwe bi kurdî amade bikin, em bi kelecan in."

xwebûn

12-18 Cotmeh 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 43

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazışleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Dîroka winda û çavkaniya şaristaniyê

**Serhed Kaya**

*Dinya di destên du-sê kesên nezan de ye*
*Difikirin ku hemû zanyarî bi wan re ye*
*Bila li zora we neçe, ker keran diecibîne*
*Di wan de qenciyek heye ji me re gaziya wan ên xerab*
***Xeyyam***

Diyalektîka paşeroj, dema em niha tê de dijîn û pêşerojê derxist holê ku heger paşeroj were zanîn, avakirina siberojê dikare di demê de pêk were; paşeroj tune be, dem jî ne diyar e. Û kesên dema wan nediyar e jî nikarin pêşeroja xwe diyar bikin.

Lêkolîn û ramana li ser vê mijarê di diyalektîka “hebûn-çêbûn-demê” ya felsefeyê de xebata seranserî xirabkirina paşerojê têkiliya bi qasî qehweya ez niha vedixwim; holîstîk, sîmbiyotîk û ya afirandina hevdu ye.

Tiştek wisa ye ku hebûna bûyerekê bi bûyera din ve, hebûn û bûyîn bi hevdu ve girêdayî ne. Ew jî wekî vîna enerjiyê ku bikeve laşekî; bûyîna hebûnê û tevgera pêvajoya hebûnê demê jî diafirîne.

Em dikarin bibêjin bûyîna heyberê tune be, wê dema wê jî tune be. Di vê çerçoveyê de, têkiliya sîmbiyotîkî di navbera "duh-îro-sibê", "paşeroj-guncav-pêşeroj" û "bûyînheyber-dem"ê de rastiya, yekê bi tena serê xwe tune be, wê rastiya ya din jî tune be. Heger tiştek bi vî awayî hebe jî wê ev kêmesiyek û qusûrek be.

Di vî alî de,  ew ên xwe zanist dizanin zanistiya dîrokê bi pêşniyarên mîna BC-AD, BC-MS û "prehistoric", didin naskirin û etîket dikin. Bi têgihîştina dîroka makroyî ya gelan dabeş dikin û nirxên mirovahî û mirovahiya gerdûnî bi têgihîştinek mîkro-dîrokî ya nikare ji çîrokan wêdetir here, di demê de dîl digire. Roleke wiha hilgirtine ser xwe.

Pergala hegemonyayê ya navneteweyî niha bi heman şêwazên polîtîk, bi taybetî gelên Rojhilata Navîn û bi giştî tevahiya mirovan bêbîr û dîrok dihêle û bîra wan a civakî tune dike. Ev rêbaz yekane rêbaza koletî û kolonîkirina civakan e. Dabeşkirina bîra civakî ya wekî Heskîfê di derheqê pratîkên êrîşkaran de yên îdeolojîk û fizîkî yên serwerên li ser dîrokê dide der.

Dîrok wekî rehên darê ye. Gelên ku dîroka xwe nizanin mecbûr in ku bi hişmendiya dîrokî ya gelên desthilatdar bijîn. Îro, gelek mirovên ku hewl didin di jiyana bajarvaniya şaristaniyê de bişkok bavêjin, ji ber ji xwe ne bawer in wekî darekê nikarin bistiyan jî bidin. Sedema derketina tîpolojiyên ji xwe nebawer, xwe nexweş dihesibînin û bi vê rewşa xwe ajîte dikin û civaka xwe li ber civaka serdest kêm dibînin. Sempatiya wan ji civak serdest re heye. Bêguman ji ber kêmasiyan, hay û bayê wan ji têgihîna civaka dirokî tune ye.

Şaristaniya rojava ku hewl dide dîroka rojhilat ji holê rake, bi wergirtina mîrateya çandî ya rojhilat re xwe afirandiye. Li ber çavkaniyên kolanên arkeolojîk, mirov dikare bibêje ku hemû pêşiyên jiyana civakî li Mezopotamyayê pêk hatine. Şaristaniya rojavayî ev orjînên pêşiyan ji holê rakirine û ew pêşî ji hişmendiya xwe ya hegomonîk re kirine mal. Bi lîstika ku wekî topa dara-topa garanê tê zanîn wek pêşvebirina beyzbolê lanse dike û dîsa lîstika ku wek birrê tê nasîn, bi îdeaya pêşvebirina fitbola amerîkî didin naskirin; ev ji bo fêmkirina mijarê wê bibe mînakek. Ev jî tê vê wateyê ku bingeha beyzbolê û fitbola amerîkî ji topa dara û birrê standine.

Vê rewşê di nav gelên ku dîroka wan hatiye dagirkirin de, bi taybetî di fîlma "Lacasa de Papel" de, derketiye pêş: "Rehîneyên hatine asta fêmkirina dîlgirtiyên hestên xwe û piştre dest bi alîkariya wan kirine, di dawiyê de xwe bi wan re wek wan dîtine û vê jî sendroma Stockholmê derxistiye holê, lê dijberiya vê jî li desthilatdarên dîrok teslîm girtine de wek dilgirtiyên ku xwe bi rehîneyên xwe re bi hestên kûr ve girêdayî ye’’.

Ez texmîn dikim êdî wê çêtir be ku taybetmendiyên mîmariyê yên qelax, zîgûrat û pîramîdên ku diyalektîka hêz û civakê dihewînin diyar bikim.

*Dîrok û teoriya mîmariyê bi piranî di bin desthilatdariya ramanên navendî yên hogemonyaya navneteweyî de ne (DYA, Îsraîl, Îngilistan). Dîroka şaristaniya navendî û dîroka mîmariyê di heman navî de tên vegotin û wekî rodiyê navikê li hevdu tên zêdekirin. Navbera mercandina dîroka hêzê ya mîmariyê ya koka wê jixwe dizane û rastiya ontolojîk a mîmariyê de hîmeke pir cidî heye, lê belê piştî dagirkirina qada mîmariyê ya ji hêla şaristaniya navendî ve, sekna li ser mîmariyê ya bi serê xwe jî wê xeletiyên cidî derxe holê.*

*Dema ku em li ser bingeha saziyên mîmarî zîgûratên Sumer û pîramîdên Misrê diseknin, mezinahiya wê jî mîna veqetandina hêz û civakê ye. Nasnameya wateya teolojîk a ji hêla mîtolojiyê ve hatî çêkirin û pêşveçûna hêzê ya bi Mîr-Xwedê ve xwe bi rêya mîmariyê sembolîze dike. Mezinahiya pîramît û zîgûrata bi awayekî sêçik hatiye avakirin. Hemû pîramîd û zîgûrat bi girseyî bi vî şiklî tên avakirin. Zîgûrat, pîramîd û sfenks tên wateya veguhastina barê giran a mîmariyê ya heya wê rojê ji bo desthilatê. Şaristaniyên Sumer û Misirê ji nişkê ve derneketine holê an jî ji ezmên bi zembîlê daneketine. Pozîtîvîzma di teoriyên mîmariyê de an bingeha vê mîmariyê paşguh dike an jî wê dike qurbanê rêbaza zanistiyê (Amed 2016).*

Sembolîzekirina vê rewşa pêşîn, agahiyên ku ji ekolên hişmendiya Rojhilata Navîn hatine wergirtin, derketina yekem a metodolojîk, wek ku ew hatin kom kirin û formek bi dest xistin da ku kûrahiya di navbera hêz û civakê de kûrtir bikin. Lewra zîgûrat, pîramîd û sfenks jî ji mîmariya qelaxê hatin derxistin û li hember mîmariya civaka xwezayî ya mutewazî bi endeksa hegomonîk û hêza ku îsraf kiriye, bûye çavkaniya îlhamê ji bo xwedîkirina hêz û mîmariya hiyerarşîk.

Mînakên bikaranîna stûnên darîn ên axuran ku ji bo li ser lingan bisekinin, piştre bikaranîna wan a qesr û perestgehan wek stûnên qerase, veguhastina ayîn, cejn û rîtuelan di mihricanên ku gel lê dicivin bo olîmpiyatan, kûrkirina qutbûna hêz û civakê nîşan didin û mirov pê serwext dibe.

Gotina ku bingehên van avahiyan mîmariya qelaxî ye, ez bizanibim jî wê li dijî kesên ku sendroma Stokholmê dijîn û têgihên dirokî yên sexte û afirandinên wan dîl girtibin jî, di diyalektîka "duh-paşeroj-bûyîn û îro-niha-hebûn"ê de her tim ez ê li te bigerim; HEQÎQET!





**Çevkanî:**
Nûman Amed, Têgîn û Teoriya Hunerê
(Kavramsal ve Kuramsal Olarak Sanat)




# Zrîng bi formateke nû derket

Navenda Nûçeyan

Kovara Zrîngê ya xêzeroman ku mehê carekê dihat weşandin, di meha cotmeha 2019’an de bi 32 rûpelan dest bi weşanê kir. Kovar heta meha adarê bi 6 hejmaran weşana xwe domand û bi mijarên cuda gihîşt ber destê xwîneran.

Piştî ku di meha adarê de bi awayekî fermî vîrûsa koronayê li Tirkiyeyê hat ragihandin û pêketiyên vîrûsê hatin aşkerakirin, kovarê ji neçarî navbera da weşana xwe.

**Xêzeromanî terikand**

Piştî navberdayîna 7 mehan, kovarê dîsa dest bi weşana xwe kir, lê ne bi awayekî xêzeroman. Şewaza xêzeromaniyê şêweyeke nû bû û cara yekemîn di kovargeriya kurdî de bi kovara Zrîngê hat ceribandin.

Li gel serkeftîbûnê jî daxwaza xwînerên Zrîngê bi giranî li ser mîzahê bû. Ji ber vê sedemê kovarê di serdema xwe ya nû de terka şêweya xêzeromanê kir. Ji niha şûn de dê kovar mîzahê derbixe pêş û weşana xwe wiha bidomîne.

Di weşana nû de kovar bi 28 rûpelan tê weşandin.

**Xêzkar û nivîskar**

Ji ber guhertina şêwazê ji neçarî di kovarê de hin guhertin pêk hatin. Formata kovarê guherî û gelek xêzkar û nivîskarên nû li kovarê zêde bûn.

Xêzkarên vê hejmarê; Mustafa Yaman, Erceren, Kubîlay Odabaş, Zehra Dogan, Bunyamîn Karakoç, Eşref Mumcu, Berçem, Hakan Esen, Servet Şêr, Mazlûm Dijî û Siyaland in.

Her wiha Şêx Zubêr,  Ozgur Amed, Ikram Balekanî, Mehmet Erbey, Mem Aliyê Kamûr û Azad Kutî jî bi nivîsên xwe di kovarê de cih digirin.

Kovarê di bergaha xwe ya pêşîn de, bi wêneyê dayikeke ku li kolanê nanê bermahî berhev dike, cih da qeyrana aborî ya Tirkiyeyê û daxuyaniyên Wezîrê Xezîne û Darayê yê Tirkiyeyê Berat Albayrak ên der barê mijarê de.